PIŞTÎ CIVÎNA HAZIRIYA AVAKIRINA PARLAMENTOYEKE DERVE RÊXISTINÊN KURD ÊN LI EWRÛPAyê GIRANIYA XWE DAN SER KARÊN DÎPLOMATÎK

# DI DÎPLOMASIYÊ DE GAVÊN MEZIN

● Li gorî derdor û pisporên siyasî, kurdan ji Amerîkayê heta Awistralyayê, xwe organize kirine û têkiliyên dîplomatîk danîne. Nivîskar û siyasetvanên tirk bi xwe jî êdî vê rastiyê qebûl dikin û pê nexweş bin jî di nivîsên xwe yên rojên dawî de bala dewleta xwe ya neçare dikişînin ser serkeftinên kurdan ên di warên dîplomasî û siyasetê de.

● Li gorî agahiyên ku me ji komîteya rêvebir a parlementoya Kurdistanê ya li derve standine, di rojên pêşiya me de wê ger, serdan û civînên girîng pêk bînin. Eleqedarên xebatên parlementoyê didin zanîn ku programeke birêkûpêk û dagirtî li ber wan e.

Rûpel 2–3

Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ · SAL: 1 HEJMAR: 12 · 5 REŞEMÎ 1995 · BUHA:25.000 TL(KDVD)



## JI BO RIZGARIYÊ DIVÊ EM ÎNSANÊN XWE BIGUHERÎNIN

Nivîskarê kurd Ezîz Akreyî dibêje ku ta şexsiyetên nû zêde nebin li nava kurdan, rizgariya welêt bizehmet e.



● Yekîtî bi qiseyan nabe. Di vê qonaxê de gelek zehmet e. Yekgirtina zimanê kurdî ku zimanekî neteweyî ye, ez amelî nabînim. Di vê qonaxê de gelek bizehmet e. Heta dewleta Kurdistanê çênebe, nabe. Dewlet çêbû, wê akademiya kurdî hebe, zimanzanê kurd wê bixebitin

● Tenê ne serokatî. Lazim e ev hereke bihele, xebateke nû çêbibe. Yanî ev hereke ku niha li Başûrê Biçûk heye, li Bakur heye lazim e têkeve Başûrê Mezin jî. Başqe çi rê nîn e. Hezar car Kurdistanê çêkin bêfeyde ye. Her wekî me got, yekgirtin bi qiseyan nabe, ji bo yekgirtinê şexsiyeteke nû lazim e.

Rûpel 8–9

### Vladimir Mayakovsky

Di helbestê de mesajeke polîtîk heye. Di tekoşîna nava çînên bindest û serdestan de ew raste rast cihê xwe eşkere dike û bi pênûsa xwe jî gefan li serdestan dixwe. Di van rêzan de li dijî jiyana wan, hunerê wan derbên xedar hene: "Gelê deusan bigirin bajarên wekî Nice, bi rihetiya xwe!..." Ên ku di nava rihetiyê de dijîn kî ne?

Rûpel 11

### Yezdana evînê Afrodît kurd e?

Şerîda dîrokê dirêj e. Li ser vê şerîdê 2500 salan berê, Grekî li Atînayê li nefs û kesanetiya xwe digeriyan. Îro, kurd li ber lingên Ferad û Dîcleyê li hebûna xwe dikolin. Gelo ew kî ne? Ji ku tên? Bav û kalên wan, dara xizmetiya wan?.. Helbet rewşa ku em tê de ne, vê ji me dixwaze.

Rûpel 7

### Lawanî başûr, dûr le welat

Mêjûy derçûnî kurd le başûr ewe berew Ewrupa zor kon niye, belku degerêtewe bo salî şestekan û ew demane xelkêkî zor kem le derewe bûn, belam diway hereshênanî şoreşî gelî kurd le salî 1975, be sedan xêzan û mirovî selt ke rastewxo le xebat da beşdar bûn rûyan le henderan kird, le ber ewey bawerya be rijêmî baas nebû û neyanxwast bênewe jêr sayey ew rijêm e.

Rûpel 10

www.arsivakurd.org

JI ROJEVÊ

## Xebatên Dîplomatîk

**Kurd di warê siyasî û dîplomatîk de gavên berbiçav diavêjin. Îlankirina Parlamentoya Sirgûnê ya Kurdistanê û îmzekirina Peymana Cenewreyê ji van hewlan tên jimartin. Hem endamê Komîteya Amadekar a Parlamentoya Sirgûnê û hem jî rayedarên PKK'ê li paytextên dewletên mezin ketine nava xebatên dîplomatîk û siyasî. Endamên Komîteya Amadekar ku ji 23 kesan pêk tê û di nava wan de nûnerên hindikahiyên etnîk û rêxistinên dînî jî hene, bi endam û rayedarên partiyên îktîdar û muhalefetê yên Ewrûpî re danûstandinan dikin. Di nava wan dewletan de navê Rûsya, Avusturya, Îtalya, Hollanda, Almanya û hwd. derbas dibe. Li aliyê din çalakî (faaliyet)yên PKK'ê jî bala derdorên siyasî û dîplomatîk dikişîne. PKK'ê, ji bo ku mîna aliyekî şer were qebûlkirin Peymana Cenewreyê îmze kir. Roja 24'ê rêbendanê li ser navê PKK'ê Alî Sapan û li ser navê Xaça Sor jî Andre Collomb ev yek pêk anîn. Ev gavavêtinên PKK'ê wekî "xweguhartinê" têne binavkirin. Her wiha hewl û serkeftinên wê yên di warê dîplomasiyê de dewletên eleqedar dixe nava endîşeyê. Lewre tirsa wan ew e ku PKK xwe bi dewletên Ewrûpayê û Amerîkayê bide qebûlkirin.**

### ÊDÎ DERDORÊN SIYASÎ Û PISPORÊN SIYASETÊ YÊN PIŞTGIRÊ DEWLETA TIRK JÎ QEBÛL DIKIN KU;

# KURD DI DÎPLOMASIYÊ DE GAVÊN MEZIN DIAVÊJIN


Alî Sapan li Atînayê piştî civînê ziyafet da giregirên dîplomat.

Li gorî derdor û pisporên siyasî kurdan ji Amerîkayê heta Awistralyayê, xwe organize kirine û têkiliyên dîplomatîk danîne. Nivîskar û siyasetvanên tirk bi xwe jî êdî vê rastiyê qebûl dikin û pê nexweş bin jî di nivîsên xwe yên rojên dawî de bala dewleta xwe ya neçare dikişînin ser serkeftinên kurdan ên di warên dîplomasî û siyasetê de.

Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) li Ewrûpaya Rojhilat, welatên wekî; Bulxarîstan, Romanyayê û li Yewnanîstanê, Rûsya û welatên Kafkasyayê, heta li Afrîkaya Başûr nûnergeh, komele û buro vekirine û kar û barên dîplomatîk dimeşîne. Tê ragihandin ku li Amarîkayê, PKK buroya xwe mezin û bi kadroyên gihiştî xurt dike. Ji hêla din ve jî bi alikariya kurdên li wir têkiliyên xwe bi pêş ve dibe.

**Li Atînayê civîna çapemeniyê**

Li gor agahiyên ku me ji komîteya rêvebir a parlementoya Kurdistanê ya li derve standiye, di rojên pêşiya me de wê ger, serdan û civînên girîng pêk bînin. Eleqederên xebatên parlementoyê didin zanîn ku programeke birêkûpêk û dagirtî li ber wan e û di nava çend rojan de wê dest bi gerên ji bo têkiliyên dîplomatîk bikin. Gera dîplomatîk a dawî ya li ser navê komîteya Parlementoyê roja 2'yê reşemiyê ji aliyê berdevkê ERNK'a Ewrûpa Ali Sapan ve hate kirin. Ali Sapan roja pêncşemê li paytextê Yewnanistan li Atînayê civîneke çapemeniyê li dar xist û piştî civînê ziyafetek da nûner, mebûs û balyozên dewletên biyan. Gelek rojnamevan û ekîbên televizyonan beşdarî civîna çapemeniyê bûn. Li ser amadekarî û xebatên ji bo avakirina parlementoya Kurdistanê ya li derve Ali Sapan wiha got: "Pênc grûbên xebatê yên ku ji aliyê komisyona me ve hatiye tesbîtkirin haziriyên ji bo avakirina parlementoyê didomînin. Ev grûb xebat û gerên xwe yên dîplomasiyî hem li Ewrûpa hem jî li derveyî Ewrûpayê pêktînin. Komîsyonên amadekar ên paremeentoyê di meha reşemiyê de bi civînên mezin ên bi gel re û bi konferansên hilbijartinê wê endamên parlementoyê hilbijêrin."

**Armancên nêzîk û dûr**

Piştî civînê li ser navê Welatê me nûnerê me yê Atîna çend pirs ji Berdevkê ERNK'a Ewrûpa û herwiha endamê komîteya amadekariya Parlementoya Kurdistanê ya li derva Ali sapan kirin.

**Endamên komiteya amadekar di civîn û dîtinên xwe de dibêjin ku wê yekparetiya erdê Tirkiyeyê biparêzin?**

– Divê mirov hinekî li gorî demê bifikire, îro di şerê me de hinek armancên nêzîk hene û hinekên dûr, parlamento armanceke nêzîk e, li gorî armancên nêzîk, wê bernameyekê derxe. Ew behtir li ser armancên nêzîk disekine.

**Parlamentoya Kurdistanê li derve, çawa li parlamentoya Başûr dinêre û dîtina we li ser şerê birakujiyê çi ye?**

– Li gorî dîtina me ew parlamento bi rastî nameşe. Îro dinêrin tu tesîra wê tune ye. Di navbera hêzên Talabanî û Barzanî de şerê birakujiyê heye, endamên wê parlamentoyê nikarin tiştekî bikin û ji xwe re rûniştine, greva birçîbûnê dikin. Di cihanê de me tu caran nedîtiye û bihîstiye ku parlamentoyek ji bo ku qerarên wê bên pêkanîn, endamên wê ketine greva birçîbûnê. Bi wî tiştî derdikeve meydanê ku tu giraniya parlamentoyê tune. Hilbijartina Parlamentoyê jî ne bi şêweyekî demokratîk bû. Heke mirov balê bidê, dîbîne parlamento di navbera her du hêzan de nîvî nîvî hatiye parve kirin. Di gel van hemû kemasiyan em dîsa jî parlamentoya başûr pîroz dikin, gaveke baş bû.


Li ser şerê birakujiyê jî ez dixwazim vê bibêjim ku ev şer ne tenê şerê YNK û PDK ye. Li pişt vî şerî dewletên mezin hene; li aliyekî Tirkiye, Fransa û Almanya Barzanî digirin, li aliyê din Amerîka û Brîtanyaya Mezin li pişt Talabanî ne. Bêguman herdu alî jî li gorî berjewendiyên xwe vî karî dikin. Heke mirov bi vî çavî li meseleyê binêre, tê dîtin ku şer şerê dewletên biyan e, li ser xaka Başûr dimeşe. Gelê me tenê ji wî şerî zirarê dibîne. Li wir helwesta PKK'ê çi ye? Em dibêjin pêwist e ev şer were sekinandin, ji bo wê jî dixebitin. PKK li wir di nava gel de xebatê dike da ku gel li hemberî dijmin rake ser piyan. Em bawer in ku bi avakirina yekitiyeke demokrat û neteweyî wê bikaribin nexweşîn û problemên Başûrê Mezin çareser bikin. Bi rastî li Başûrê Mezin fersendeke girîng ji bo kurdan derketiye, hemû kurd pêwist e ji vê fersendê îstifade bikin.

BEKİR BAHOZ

## Li Atîna, Navenda Çanda Kurdistan vebû

Roja 29.1.1995'a li Atînayê, ji aliyê berpirsiyarê ERNK'ê ya Balkana, Navenda Çanda Kurdistan hat vekirin. Di şahiya vekirînê de hejmarek mezin kurdên welatparêz ku li Yewnanîstanê dijîn amade bûn. Kom û grûbên muzîkî berhemên xwe pêşkêş kirin. hate gotin ku;" Armanc ji sazkirina vê navendê xurtkirina yekîtiya gelê kurd li ser erdê Yewnanistanê ye û bihêzkirina têkiliyên gelê kurd bi gelê Yewnan û gelên din re ye.

**Welatê Me / Atîna**






## Münir Ceylan ji hepsê derket

Serokê Sendîkaya Petrol-Îş'ê yê berê Münir Ceylan roja 29'ê rêbendanê cezayê xwe xelas kir û ji girtîgeha Sarayê derket. Gelek karker û sendîkavanên demokrat çûn pergî wî. Münir Ceylan li ber deriyê girtîgeha Sarayê ku ew 242 rojan lê mabû axaftinek kir. Di axaftina xwe wî da zanîn ku meseleya Tirkiyeyê ya sereke pirsgirêka kurdî ye. Serokê Petrol-Îş'ê yê berê Ceylan got: "Divê mirov bêtirs biaxivin."

Ceylanê ku ji ber nivîseke xwe ya di Yeni Ülkeyê de derketî 20 meh ceza xwaribû daxuyand ku divê meseleya kurdî bi riya aştiyê bê çareserkirin. Di gel gelek karkerên petrolê, nas û dostên wî Serokê Belediyeya Sarayê Erdoğan Kaplan, Serokê Hava-Îş'ê Atilla Ayçin û Serokê Petrol-Îş'ê Adnan Özcan hatibû ber girtîgehê.

**Rapora DYA'yê ya 1994'an:**

## 'Ji kuştinan hêzen dewletê mesûl in'

Li gorî rapora Dewletên Yekbûyî yên Amarikayê (DYA), hêzên dewletê ji kuştinên 'failî meçhûl' berpirsiyar in.

Rapora DYA'ê ya di 1994'an de mafê mirovan, roja 1'ê reşemiyê ji aliyê Cîgirê Wezîrê Karê Derve John Shattuck ve Li Washington'ê hate xwendin. Di raporê de rexneyên tûj li Tirkiyeyê tên kirin û tê gotin ku di sala 1994'an rewşa mafê mirovan li Tirkiyeyê xerabtir bûye. Di vê rapora ku ji Tirkiyeyê re cihê herî zehf (39 rûpel) hatiye veqetandin de, tê gotin ku hêzên dewletê li kurdan zilmê dikin, îşkence zêdetir bûye, mirov ji aliyê hêzên dewletê ve tên kuştin, li Tirkiyeyê serbestiya bîr û baweriyê tune û çapemenî ne serbest e. Di raporê de rexne li PKK'ê jî tên girtin, ew wekî hêzeke "terorîst" tê bi navkirin.

**Navenda Nûçeyan**

## Leyla Zana berendama xelata Nobelê ya Aştiyê

Parlementerên Norwecê, mebûsa DEP'ê ya berê Leyla Zana, ji bo berendamiya Xelata Nobelê ya Aştiyê destnîşan kir. Wan, di daxuyaniya xwe de da zanîn ku, Leyla Zana, ji bo ku pisgirêka Kurd û Kurdistanê bi aştiyê çareserbibe gelek xebatên balkêş kirine. Ji bo vê yekê ew ketiye zindanê. Wê wekî endama rêxistineke çekdar nîşan didin. Disa dibêjin kuew xebatên Leyla Zana yên, ji bo aştiyê hêja dibînin û li pişt in. Ji ber vê yekê wê, berendama Xelata Nobelê ya Aştiyê ye nîşan didin.

**Navenda Nûçeyan**



## Mafên zarokên kurd qedexe ne

Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel, Peymana Mafên Zarokan tesdîq kir. Ji aliyê din ve tahdît danî ser bendên ku hin mafan dide zarokên hindikahiyan. Tê gotin ku, ji bo rê li ber mafên zarokên kurd were girtin ev tahdît hatine danîn. Li gorî peymanê, dewlet ji bo ku hindikahî karibin zimanê xwe biparêzin û bipêşve bibin divê di warê perwerdeyî û weşanê (TV. Radyo û hwd.) de alîkariyê bide wan. Lê ji bo ku zarokên kurd van mafan nikaribin bidest bixin, Komara Tirk tahdît danî ser bendên 17, 29 û 30'yan. Peyman di sala 1990'an de hatibû îmzekirin û roja 9'ê berfanbarê jî meclîsa tirk peymanqebûl kiribû.



Zarokên kurd ji mafên navneteweyî nikarin îstîfade bikin.

## Greva birçîbûnê gihîşt roja 46'an

Dîlên di zîndana Bucayê û Aydinê de, ji bo bidestxistina hin mafên xwe yên mirovî, ev 46 roj in ku di greva birçîbûnê de ne. Ji girtiyên ku grevê didomînin, 53 kes ji aliyê tenduristî(sihet) ve, di rewşeke xerab de ne. Malbatên girtiyan û ebûqatên wan, daxuyandin ku, heke daxwazên girtiyan neyên qebûlkirin, wê di demeke nêzîk de mirin dest pê bikin.

Li aliyê din malbatên girtiyan jî, ji bo piştgiriya zarokên xwe, ji destpêka grevê ve livbaziyên cur be cur pêk tînin. Roja 31'ê rêbendanê malbatên dilên di zindana Bucayê de, riya ku diçe girtigehê girtin û bi bi sloganan desteka xwe nîşan dan. Di vê livbaziya ku ji aliyê 300 kesên ji malbatên girtiyan pêkhatibû de, trafîka cadeya Menderes hate birîn û ev livbazî nêzîkî nîv saetî domiya. Dû re polîsan êrîşî malbatan kir û hin kes di vî êrîşî de birîndar bûn.

Ebûqatê girtiyan Kemal Bilgiç, daxuyand ku ji bo çareserkirina vê pirsê hevdîtinan bi rêvebiriya girtîgehê re dest pê kiriye û ji bo çareyê hêvî heye. Ebûqat Bilgiç li ser rewşa girtiyan jî sekinî û diyar kir ku hin ji girtiyan di sînora mirinê de ne û divê rojekê zûtir daxwazên girtiyan bêne pejirandin û dawî li vê livbaziyê bê.

**Girtî çi dixwazin?**

Girtiyên Bucayê bi girîngî li ser sê madeyan disekinin.

1– Mafê nûnerîtiya siyasî

2– Divê hemû girtiyên siyasî li yek maltayê bêne civandin

3– Deriyên ku li maltayê vedibin, divê di navbera 08:00 û 17:00'an de vekirîbin û hin daxwazên din

Ebûqat Kemal Bilgiç daxuyand ku, îhtîmala pejirandina van madeyan heye û bi rêveberiya girtîgehê re hevdîtinên wan didomin. Divê navê de Komeleya Mafên Mirovan şaxa Stenbolê, piştgirî da girtiyên Buca û Aydinê û daxuyand ku, divê daxwezên girtiyan bêne pejirandin.

**Girtîgehên ku lê greva birçîbûnê didomin:**

Ji bo piştgriya berxwedana li girtîgehên Aydın û Bucayê, li gelek girtîgehên din jî grevên birçîbûnê didomin. Girtigehên ku ji bo piştgiriyê dest bi greva birçîbûnê kirine ev in.

Ceyhan, Çanakkale, Çankırı, Nevşehir, Amasya, İskenderun, ankara û Malatya.

Li aliyên din li girtîgehên Entab û Elbistanê jî, girtiyan ji bo bidestxistina mafên xwe dest bi greva birçîbûnê kirin.

**Navenda Nûçeyan**

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 10'an de peyva veşarî **'Salname'** dîtine û pirtûka "Evîna Welat" qezenc kirine

**Nefya Korkut**
**Stenbol**

S. Eyubi Sertkaya
Kızıltepe

**Hamza Yıldız**
**Zonguldak**

Ali Hasgül
Burdur

**Mehmet Kaya**
**Edene**

Ronayi
Ruha

**Ahmet Ülgen**
**Semsûr**

Coşkun Selçuk
İskenderun

**İsmet Bulut**
**Enteb**

Başak
Mersin

### JI DU SAZIYÊN KURD ÊN LI STENBOLÊ, LI HEMBERÎ ÊRÎŞÊN ÇAPEMENIYA TIRK

# Nameyek ji Yaşar Kemal re

Bi nivîsîn û axaftinên xwe li rastiya gelê kurd xwedî derketina we, em gelek dilgeş kirin. Her wekî ku hûn jî dizanin, gelê kurd gelekî kevnare yê Rojhilata Navîn e. Kultura kurdan a kûr û zimanê kurdî yê dewlemend, ji aliyê dewletên ku gelê kurd û welatê kurdan di nav xwe de parve kirine, tê dixwestin ji holê bê rakirin.

Kultura kurdî, parçeyek ji medeniyeta Mezopotamyayê ye û rola vê kulturê ya di avabûna kultura mirovahiyê de li ber çavan e. Bi ziman û kultura kurdî re dijminatî kirin; bi rê û metodên nemirovî êrîşkirina ser vê rastiyê, bêguman xesarê digihîne hemû mirovahiyê.

Pîvaneke mirovî, ronakbîrî, welatperwerî û demokratbûnê jî, li mozayîqa gel û kulturan xwedîderketin e.

Yaşar Kemalê hêja;

Gelê kurd, ev gelê Rojhilata Navîn û ku ji hemû mafên xwe yên neteweyî û mirovî bêpar e; ev gelê dadperwer, mêvanperwer, camêr û mirovhez, vî gelê ku bi mêrxasiya xwe di dîrokê de navê xwe kola ye; ev gelê ku gelek rûpelên berhemên we xemilandine; ev gelê ku hûn bi xwe jî mensûbên wî ne, îro li hemberî lîstik û senaryoyên niyetxerab li ber xwe dide.

Dewleta Tirk a ku ji mafên mirovî û azadiya ramanî (fikrî) re, ji roja ku ava bûye heta îro neyar e; ji nivîs û axaftinên we yên ku rastiya gelê kurd dinîn zimên re jî, tebat nekir. Dadgeha Ewlekariyê ya Dewletê, ku dûmahîka dadgehên Îstîklalê yên ku bi hezaran mirovên me şandine darên sêpiyan e, îro jî cezakirina we dixwaze. Hêzên serwer ên Dewleta Tirk, wekî ku hûn jî di nivîsên xwe de beyan dikin, ewê nikaribin pêsîra xwe ji destê dadgehên mafên mirovî yên gerdûnî û navneteweyî rizgar bikin.

Yaşar Kemalê hêja;

Divê hûn bizanibin ku wekî hemû sazgehên demokratîk, Enstîtuya Kurdî jî, bi we re ye. Di dadgehên ku dixwazin bindestî û koletiyê wekî jiyanê nîşan bidin de, rastî, azadî û mirovahiyê biparêzin. Bi mêrxasî li deng û rastiya mirovahiyê xwedî derkevin; ji bîr nekin ku hûn mensûbên gelê kurd, mensûbên gelekî kevnare û mêrxas in. Çavê gelê kurd û hemû mirovatiyê li ser we ye.

Enstîtuya Kurdî, di azmûna (îmtîhana) mirovahiyê de serkeftina we dixwaze. Bi gotina we, "An hovîtî, an mirovahî."



Bi silavên germ

**Enstîtuya Kurdî**
**Navenda Çanda Mezopotamya**

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata vê heftiyê pirtûka **Harold Pinter "Zimanê Çiya"** ye.


**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê binivîsînin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**



"Zimanê Çiya"
**Harold Pinter**

## XAÇEPIRSA BIXELAT




**PEYVA VEŞARÎ** ① ② ③ ④ ⑤ ⑥ ⑦ ⑧ ⑨


# AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 35 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 70 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 140 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..............................
**NAVNÎŞAN** : ..............................
..............................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 2491344 – 245 29 91

DIK

## Senor X Gonzalez e?

Li Ispanyayê Serokwezîr Filipe Gonzalez bi kontratiyê tê sûcdarkirin. Di salên 1980'yî de hêzên Ispanyayî li hemberî Welatparêzên Baskê şerekî qirêjî meşand. Wan salan, bi navê Grubên Rizgariyê yên Antîterorîzmê (GAL) rêxistineke kontrgerîla derket holê. Di navbera salên 1983-1987'an de li welatê Baskiyan ku niha wekî bakurê Ispanyayê û başûrê Fransayê tê binavkirin, zêdetirî 30 kesî bi destê vê rêxistinê hate kuştin. Di nava van de hinek serkêşên ETA'yê jî hebûn. Serokê vê rêxistinê xwe wekî 'Senor X' bi nav dikir. Niha tê gotin ku 'Senor X' Serokê Partiya Sosyalîst û Serokwezîr Filipe Gonzalez bûye. Ji ber vê yekê di gel hemû rexneyan hikûmet naxwaze hilbijartina zû îlan bike. Her çiqas Gonzalez îdîa kir ku ev tiştê ne raste jî, zêde kesî ji wî bawer nekir. Li gorî lêpirsîneke dawîn, gelê Ispanyayê zêdetirî ji sedî 50 bawer dike ku, Gonzalez rastiyê nabêje. Rojnameya El Munda di nava rûpelên xwe de nûçeyek weşand. Li gorî vê nûçeyê 2 polîsên ku kontratî kirine û ji ber kuştina 4 mirovan 4 sal ceza xwarine, li xwe mikur hatine ku wan her yekî ji dewletê 1.5 milyon dolar standiye. Ew pere bi riya bankeyeke Swisreyî gihiştiye destê wan.

### Ketina ordiya Rûs ya nav Çeçenîstanê serê Rûsyayê pir diêşîne

# Gelê Rûsyayê Afganîstaneke nû naxwaze

**Li gorî reqemên ku jêderkên fermî dane, di şer de tenê 617 leşkerên rûs hatine kuştin, lê hemû çavkaniyên bêteref rayedarên rûs derewkar derdixin. Li aliyê din ji ber ku hêzên Rûsyayê bajêr çekên giran dikutin û bombe dikin gelek mirovên sivîl hatin kuştin.**



Dayikên leşkeran di gel wêneyên kurên xwe şer protesto dikin.

Di navbera Rûsya û Çeçenistanê de, şerê ku di 11'ê berfanbara 1994'an de, bi êrîşên hêzên Rûsyayê dest pê kir, hê jî didome.Hêzên ku êrîş birin ser paytexta Çeçenistanê Grozniyê di gel ewqas zayiyatan hîn negihiştiyê tu encamê.


Li gorî reqemên ku jêderkên fermî dane, di şer de tenê 617 leşkerên rûs hatine kuştin, lê hemû çavkaniyên bêteref rayedarên rûs derewkar derdixin. Li aliyê din ji ber ku hêzên Rûsyayê bajêr bi çekên giran dikutin û bombe dikin gelek mirovên sivîl hatin kuştin. Ji lew re ji bo ku rastiyên şer veşêrin, Wezîr Karê Parêziyê Pavel Grachev, endamê komisyona mafê mirovan Sergei Kovalyov wekî "dijminê Rûsyayê" bi nav dike.

Her çiqas Boris Yeltsin ji bo rastiyê veşêre Gerînendeyê Televizyona Rusyayê Oleg Poptsov raste rast bi kuştinê tehdît dike jî, gel li hemberî şer dengê xwe bilind dike. Niha hejmara kesên ku piştgiriyê didin Boris Yeltsin daketiye %14'an. Dayikên leşkeran di gel wêneyên zarokên xwe meş û xwepêşdanan li dar dixin. Roja 30'yê rêbendanê birek mirov li Moskovê bi banga Tevgera Lîberxwedanê ya Rûsyayê mitîngek li dar xist. Beşdaran li dijî hikûmetê slogan avêtin û xwestin ku şer rawestê.

**Nûçeyên Derve**

### Di 26'ê rêbendanê de di navbera Perû û Ekvatorê de jî problem derket

# Kanên zengîn dibin sebebên şer




Şerê ku di navbera Perû û Ekvatorê de roja 26'ê rêbendanê dest pê kiribû, bi navberdîtina dewletên parzemîna (qite) Amerîkayê roja 30'yê rêbendanê rawestiya.

Şer di salvegera Protokola Rio Janeiroyê ya ku sala 1942'yan hatibû îmzekirin de, derketibû. Piştî ku hêzên Perûyê êrîş birin ser hinek qereqolên Ekvatorê yên li ser sînor, şer derket. Di şer de 30 kes hatin kuştin. Piştî destpêkirina êrîşên Perûyê Serokê Ekvatorê Silisto Duran Ballen li Ekvatorê rêvebeRiya awarte îlan kiribû. Serokê Perûyê Alberto Fujimorî xwestibû ku garantorên peymanê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Arjantîn, Şîlî û Brazîlya mudexeleyî şer bikin.

Cara yekemîn di sala 1941'an de di navbera herdu dewletan de şer derket, piştî ku Ekvator têk çû Perûyê bi peymana Rio Janeiro dest danî ser nîvê erdê wî welatî. Ekvatorê di sala 1960'î de ev peyman red kir. Ji ber vê yekê gelek carên din jî di navbera her du aliyan de şer derketiye.Ev herêma ku sedema şer e, ji aliyê kanên madenan û neftê ve dewletmend e.

**Nûçeyên Derve**

## REWŞA DINYAYÊ

**NIZAMETTIN TOĞUÇ**

### Valahiya ku hebû hate dagirtin

Di sala 1639'an de bi peymana Qesra Şîrîn cografya Kurdistanê di nava Împaratoriya Osmanî û Dewleta Sefawî de hat parvekirin. Piştî şerê Cîhanê yê 1'emîn meseleya Kurdistanê di sala 1920'an de di peymana Sewrê de kete rojeva dewletên mutefîk. Di destpêka vê sedsalê de li ser hîma dewleta Osmaniya wêran bi peymana Lozanê Kurdistan kirin çar perçe. Di 1923'an de li ser rûxandina Împaratoriya Osmanî Komara Tirkiyeyê hat damezrandin. Di avakirina Komara Tirkiyeyê de kemalistan alîkariyeke mezin û eşkere ji gelê kurd standin. Piştî ku kemalistan desthelatî bi dest xist, ajotin ser gelê Kurdistanê. Bi damezrandina komarê gelê Kurdistanê beraberî zordarî û astengiyên dijwar, rastî asîmîlasyon û îmhakirina neteweyî hatin. Îdeolojiya dewletê ya fermî ev bû.

Di destpêka avakirina komarê de serhildanên gelê kurd çêbûn. Ev serhildan bi qirkirin, kuştin û sirgûnê hatin şikandin. Ev rewş heya 1940' an domiya. Wê demê karbidestên komara tirk wiha digotin: "Me rehmetiya Kurdistanê di çiyayê Agirî de bin ax kir, me ser wê beton kir, êdî nema dikare ji gorê rabe."

Lê ew Kurdistan di demeke kin de, di sala 1984'an de kefen dikand, gor qelaşt, çiya hilweşand wekî birûskê derket holê. Bankir, got;" Ez li vir im. Ez nemirime, ez namirim û ezê her bijîm." Wê demê kedxwar û zordest man şaş û qêj. Belê ev 10 sal in kedxwar bi hemû hêzên xwe ve li ser gelê kurd şerekî qirêj û gemarî dide meşandin. Lê her ku diçe hêza wî dikeve û hêza gelê kurd xurt dibe.

Lewre kurd xwe nas kiriye û li her warî ji bo têkoşîna rizgariya neteweya kurd xebatê dike û gav bi gav ber bi netewebûn û dewletiyê ve diçe. Hemû sazî û rêxistinên wî yên siyasî, çandî (Radyo, T.V, enstîtu, û hwd.) hene. Lê tiştek ji mabû kêm, parlemento. Di demeka kinde ew jî tê sazkirin.

Belê hin gelên xudandewlet hene ku hejmara wan 100 hezar e. Gelê kurd li rojhilata navîn 40 milyon hene, lê hebûna wî tê înkarkirin. Pêwist e ku gelê kurd jî qedera xwe bi destê xwe xêz bike. Wekî hemû gelên cîhanê. Bi vê sebebê sazkirina Parlementoya Surgûnê ya kurdistanê pêwist bû.

Wezîrê derve yê tirkan dibêje:" Em destûr nadin ku kurd Parlementoyê ava bikin." Lê ji rexneyên dewletên biyan, newêre derkeve der..! Wezîrtiya wî bi piranî li Tirkiyeyê derbas dibe. Xwe dixapîne, bi hezar salan Komara Tirkiyeyê gelê kurd bindest û kole hiştiye. Lê xistiye, nehiştiye bigirî. Di parlamentoya xwe de wiha gotiye," Di nav sînorê Tirkiyeyê de kî bijî tirk e.Kesê xwe tirk nehesibênê tu heq jê re tune. Yek heqê wî heye ne axaftin.! Ew jî bi destûra me pêk tê." Gotineke me ji karbidestên tirkan re heye: "Gelê kurd êdî nema ji kesî destûrê dixwaze. Ew destûr (îcazeta) û pêwistî gelê kurd ji mêj ve daye me. Ew jî ji bo me bes e.

# FAL

**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Daxwaziyeke we heye, lê gerek e hûn li ser berdêlê wê bifikirin. Rojên fireh li pêşiya we hene, pereyên xwe zêde xerç nekin. Karên xwe li paş, cilên xwe li derve nehêlin, şevlêger pir in.

**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Di warê balkişandinê de, di ser we re kes tune. Li derdora xwe temaşe bikin, kesên ku li we dinihêrin niyeta wan xerab e. Dev ji hezkirina pereyan berdin. Alîkariyê bidin hevalên xwe

**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

Hûn pir zimanxweş in. Herkes dixwaze li we guhdar bike. Lê çi heyf e ku sebra we tune, da ku hûn carinan guh bidin guhdarên xwe. Ji ber ku hûn ji paşgotiniyên polîtîk yên nû bêhay dimînin, kalîteya zimanxweşiya we kêm dibe.

**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Rêkûpêkiya we baş diçe, hûn karê xwe bidomînin, da ku herdem hûn serfiraz bibin. Ji xwe netirsin jiyana we di garantiyê de ye. Diltenikiya we ji we re dibe problem û dikare zerarê bide we.

**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Îro dîsa tiraliya we li ser we ye. Bes êdî li cihê xwe rûniştî, fermanê li kesan bikin. Li cihên zehf luks jî negerin, ji bo aboriya we ne baş e. Bi hevalên xwe re kêfxweş bin. Xwarinê jî zêde nexwin.

**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Heta ku ji destê we tê, hûn rewşa xwe baş didomînin. Lê belê li ser wê yekê pir nefikirin hinekî li ser armanca xwe bifikirin û zêde bi karê xwe re meşgûl nebin. Hinekî jî li ser jiyana xwe ya derve bisekinin.

**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Her tim hûn dixwazin ku paqijî û rêkûpêkiya we baş here. Mirûzê xwe tirş nekin, kêfxweşiya xwe bidin der û bi zimanekî xweş biaxivin. Destê xwe jî nekin bêrîka xwe. Hûnê kesekî baş, nas bikin.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Kesên ku bi we re dikevin têkiliyê, bi wan re baş mijûl bibin. Li tengasiyên xwe bifikirin û riya rast bibînin. Rûyê we bila hinekî bikene. Ji riyeke dûr wê xebereke xweş ji we re bê. An jî hûnê herine cihekî xweş.

**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Çavên we her tim li ser kesên ku rewşa wan baş e. Di dawiyê de hûn jî dikarin jiyana xwe baş bikin. Xebereke nebaş wê ji we re bê, ewê li ber we riyeke nû veke. Cotek solî nû ji xwe re bistînin.

**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Kesên ku we rexne dikin, ji bo başiya we vî karî dikin. Rêzanîna we pir baş e, berpirsiyarê we li we guhdar nake. Hinekî jî dev ji serhişkiya xwe berdin. Pir îdealîst jî nebin, Xwedê tevlî karê we be.

**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Jiyana we pir rengîn e. Gelek kes dixwazin ku bi we re têkiliyan deynin, lê hûn her tim xebata xwe bidomînin, ew jî ji bo gelan muhîm e. Dev ji serhişkiyê xwe berdin. Li ser daxwazên kesên din jî bifikirin.

**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Hûn bi mîzahê re zehf eleqedar in, dev ji van tiştên vala berdin. Jiyana xwe hinekî birengînin û hêstirên çavên xwe veneşêrin bi rastî bigirîn ku dilê we rehet bibe. Bi zêdahî hez ji karê xwe bikin da ku hûn di wî warî de serfiraz bibin.




# Terorîst çawa tên girtin

Li Tirkiyeyê êdî tişt hingî teklîhev bûne, herkes li gorî xwe tiştan dibêje û dike. Di her warî de teklîheviyek heye. Tiştên normal bûne anormal û xerîp. Lê, bi piranî jî, di şerê li hemberî kurdan de tiştên sosret tên kirin û gotin.

Li gorî rêvebirên dewletê terorîst (gerîla) "ermen in, rûm in...Helîkopterên wan hene, cilên leşkeran li xwe dikin û gundan dişewitinin. Gundiyan, rojnamevanan, nivîskaran û hwd dikujin." Li gorî hinekan "cinewir in, quloçên wan hene...Hinek ji wan jî, teroristan ji çavên wan nas dikin! Vê hefteyê dîsa min, çavdariya rojnameya dikir ku ez çi bibinim? Waliyê herêma Serhedê (yê Erzerom, Agirî, Qers û hwd.) di rojnameyekê de bang dikir û digot:" Em terorîstan ji lingên wan nas dikin. Ewê dertên serê çiyan, dibin terorîst lingên wan 38, 39 numero be dibin 44, 45 numero. Em gava yekî piyê wî/wê 44, 45 numero bibînin em wî/wê digirin. Me gelek teroristan ji ber numeroya piyan naskirine û girtine."

Ez bala pîmezinan dikişînim, dema ku, çûn Serhedê hay ji xwe hebin. Li Serhedê pîmezinî mirovan dike terorîst û dide girtin.

**İSKANÊ HENÊ**

# Erebeya xalê Ezîz

Xalê Ezîz û Xalê Mistê du şirîkên hev in, diçin gundan kayê dikirin, dibin navçeyê difiroşin. Rojekê, Xalê Ezîz û Xalê Mistê wê biçin westanê kayê bifiroşin. Xalê Ezîz dibêje Mistê: "Ezê biçim Qesirkê kayê bar bikim, piştre re bêm ser Dörtyola westanê. Tu jî xwe pêk bîne were li ser Dörtyolê bimîne li hêviya min." Xalê Mistê dibêje: "Baş e." Xalê Ezîz dibêje: "Ji bîr neke tam di saet 4'an de li wir amade be." Ew li erebeya xwe siwar dibe û berê xwe dide Qesirka Mao. Xalê Mistê jî diçe malê, xwe pêk tîne.

Di saet 4'an de jî li ser riya Dörtyolê hazir dibe. Xalê Mistê bala xwe didê ku polîsek li ser rê sekiniye, fîtîkek di dêv de, firefira wî ye û îşaretan dike. Xalê Mistê bilez û bez diçe ba polîs, dixwaze hîn bibe ka erebeya Xalê Ezîz derbas bûye an na. Ji polîs dipirse: "Erebeya Xalê Ezîz gelsin geçsin? (Bila erebeya Xalê Ezîz were derbas be?)" Polîs jî dibêje: "Gelsin geçsin. (Bila were derbas be)" Ji wî ku polîs mesele fêm nekiriye, dîsa tekrar dike: "Erebeya Xalê Ezîz gelsin?" Polîs hinekî bihêrs dibe û lê vedigerîne: "Gelsin geçsin, kardeşim. (Bila bê, derbas be kekê min)" Li ser vê gotinê Xalê Mistê jî aciz dibe, bi dengekî nizim dibêje: "Kurê kerê tirk e jî fêm nake."

Îcar bi awayekî din: "Lo erebeya Xalê Ezîz, altî demîr, ustî texte, îçî dolî ka, gelsîn geçsîn?" Polîs jî aciz dibe dibêje: "Gelsin geçsin kardeşim, sen laftan anlamıyor musun? (Bila bê derbas be bira tu ji gotinê fêm naki?)"

Êdî hêviya xwe jê dibire, lê hê jî bi tirkiya wî henekan dike: "Ê mala min xera be, heke tu bi tirkî dizanî."

**CEWDET QUŞMAN**



www.arsivakurdi.org

DI ZIMANÊ LATÎNÎ DE VENUS, DI YÊ FENÎKIYAN DE ASTARTA Û YÊ GREKIYAN DE JÎ AFRODÎT

# YEZDANA EVÎNÊ AFRODÎT KURD E?



**Delala Yezdanan "Afrodît"**

Şerîda dîrokê dirêj e. Li ser vê şerîdê 2500 salan berê, Grekî li Atînayê li nefs û kesanetiya xwe digeriyan. Îro, kurd li ber lingên Ferad û Dîcleyê li hebûna xwe dikolin; Gelo ew kî ne? Ji ku tên? Bav û kalên wan, dara xizmetiya wan?.. Helbet rewşa ku em tê de ne, vê ji me dixwaze. Lê, li dîrok û kesanetiya xwe gerîn bi xwe re tevlîhevî û pirsgirêkan jî tîne, bi piranî jî ji bo me. Ji ber ku şerîda dîrokê qederekê deriyê xwe ji bo me venekiriye. Dîroka me ya berî 500 salan (P.Z Îsa) ne zelal e. Ev jî îro di me de hîsên psîkolojîkî diafirîne û ew tesîrê li lêgerîn û lêkolînên me dike. Di vî warî de, ez dixwazim li ser meseleya Afrodîtê ku Niwa Hebîb (li rojnameya Welat) û T.Dîclelî jî (li rojnameya Özgür Ülkeyê, 11.1.95) li ser wê nivîsandibûn, rawestim.

**Afrodît an jî kefa avê**

Niwa Hebîb gotina Afrodîte ji hev kiribû: Af–ro–dîta. Li ba Hebîb Af "av" an jî "kefa avê" ye. Encam: Afrodît kurdî ye û ya kurdan e. T. Dîclelî jî bi nirxandina gotina, Afrodîtê dixwaze îsbat bike ku kurdî zimanekî Îndo–Ewrûpî ye. Li gorî Dîclelî Afro "ewr" û dîta jî "dayin/dayiş" e. Afrodît dibe "bulutun verdiği (ya/yê ku ewr da). Gelo, bi ser xwe wateya Afrodîtê tenê dikare zimanê kurdî bide îsbatkirin?

Efsaneya Afrodîtê di mîtolojiya Grekiyan de cihekî muhîm digire. Li ser Afrodîtê çavkaniyên herî girîng Homer (Illaden og Odysseen; tekstên lîteraturî) û Hesold (Theogonien, ...) in ku digihîn nêzîkî 700 B.Z. li ba Homer, Afrodît keça Zeus (roj) û Dione ye. Lê, Hesokî bi awayekî din li efsaneya Afrodîtê dinêre:

**Kefa pêlên deryayê**

Ew di nav Xwedayên Olympê de Jinxwedayek e û ji kefa pêlên deryayê (afros: grekî, foam: îngilîzî) çêbûye. Navê xwe jî ji wê digire. Çîroka çêbûnê digihe Gaya (erd; earth) û Uranos (asîman) ku di hiyerarşiya Xwedayên Grekiyan de li herî jor rûdinin. Di nava Gaya û Uranus (lawê Gala ye) de dubendiyên tunde pêk tên. Ji wan 18 zarok (12 law, 6 keç) çêdibin. Lê, Uranus hîn serî de ji wan xwî/ nefret dike û nahêle ew bên dinê. Ew di laşê Gaya de dimînin. Gaya zarokên xwe kom dike û jê dixwaze ku ew ji bavê xwe yê tîran tola (heyf) xwe bigirin. Lawê biçûk Kronos wî karî digire ser xwe û li teniştа nivînên bavê xwe, xwe vedişêre. Bi şev dema bavê wî tê malê û diçe ba Gayayê hingê ew lê dixe organa cinsiyeta wî jê dike û diavêje deryayê. Ji vê kefa (afros) xwînî Jinxwedayeke ciwan û bedew peyda dibe û dibe dîlbera (droning/queen) asîman û Jinxwedaya xweşikbûnê (beauty).

**Evîna asîmanê**

Xwedê û mirov nav lê dikin Afrodît. Ba û bahoz wê didin ber xwe û dibin Kibrisê û Kytherayê, ku li wir ew îro xwedî cihên pîroz e. Li ser riya wê, cihê ku ew lingên xwe lê datîne hêşînahî radibe, gul û sosin rêz dibin. Ji bo vê yekê ew navê Jinxwedaya mezinbûn/ gihîştin û evînê digire. Bihar demsala wê ye ku ji bo mirov, lawir û darûber evîn û zayinê dide nîşan.

Bi Hefaistos re zewiciye, lê ne bibext e. Dostên wê gelek in, wekî Adonis (di nav Xwedayan de cih nagire) û Ares, Xwedayê şer (cengê). Gelek caran jî wekî parêzkêra orispiyan tê dîtin. Feylesof Platon wê wekî Afrodîta Urania (evîna asîmanê) û Afrodîta Pandemos (evîndara adî/ erzan) bi nav dike. Yanê ew di yek gewdeyî de du giyanan temsîl dike. Helbet binavkirina Platon bi ramana wî ya li ser hebûna jiyanê ve girêdayî ye. Li ba wî îdeyê mezin/rind û giyanî ku ji laş/ materyalê rizgar bûye, pîroz e. Ew wekî baniyê li ser her tiştî ye. Ev aliyê Afrodîtê ji Platon re pîroz tê.

**Afrodîta Grek**

Hadîseyên jorîn jî didin nîşan ku ev bi hezarsalan e Afrodît di nava Grekiyan de dijî û em bi çavkaniyên wan der barê wê de dibin xwedî zanîn. Grekî jî, zimanekî ku îro dijiye. Heger "afro" ji "afros"ê bê, îcar çawa Dîclelî behsa "ewr" dike? Koka "dîte/dîta" jî di zimanê latînî û grekî de heye. Mînak bi latînî "do ut des (ez didim Xwedayan)" e. Di zimanê kurdî de "dît", "dat" heb in jî ew li ser xwe nikarin îsbat bikin ku Afrodîte ji "dît"a kurdî çêbûye. Jixwe li ser xwe ziman tenê nikare wateya efsaneyan bê şîrove kirin. Efsane (myth) bi ol, civat, mentalîteya civata wê demê, dîrok û rewşa polîtîkî ve girêdayî ne: Gelo ewqas merasîm û qurban ji bo çi dihatin kirin? Mirovan ew bi daxwaz dianîn cih an xwe ji bo civat û Xwedayan bi wezîfe didîtin? Psîkolojiya ku li paş efsaneyan dirêj dibû, çi ye? Gelo mirov dikare bibêje ku Hesoid hadîse ji dûrî rewşa civata ku ew tê de jiyaye, aniye zimên? Tenê bi wateya gotinan şîrovekirina efsaneyan, ji min re wekî di dîrokê de nedîtina mirovan tê. Ji ber ku gotin bi rasthatinê jî dikarin bikevin zimanekî.

**Venusa Latînî**

Helbet grekiyan ewqas efsane bi serê xwe neafirandine. Çawa ku feylesofiya civatên cîranan tesîra xwe li grekiyan kirine, her wiha efsaneyên wan jî di bin tesîrê yên cîranan de mane. Gelên ku cîranên hev bûne, danûstandina wan bi hev re hebû. Û di vê danûstandinê de gelek caran wan ji hev tiştgirtine û navên wan guherîne; wekî Afrodîtayê ku bi latînî bûye Venus. Car din hinek çavkanî didin nîşan ku Afrodîta Astarta'ya Fenîkan e û nefşê wê ji Asyayê ye. Hedîseyên wekî jêkirina organên cinsiyetê, ku berê grekiyan li oryantalê jiyane, vê tesbîtê dişedînin.

**Ziman û efsane**


Di warê jêkirina organên cinsiyetê de hedîseyeke ku dişibe yê Afrodîtayê di nivîsên hîtîtiyan de (nêzîkî 1200 B.Z.) heye. Hedîse der barê dubendiyên nava Xwedayan e ku hîtîtan ji huriyan girtine. Hingê hurî li rojhilata Anatoliyê dijiyan. Xwedê asîmanê Anu desthilatiyê ji Alaluyê digire û 9 sal birêvebirinê digire destê xwe. Paşê Kumarbî li dijî wî têdikoşe û organa cinsiyetê ya wî jê dike û dixwe. Lê, hinekî vedişêre/ dike der. Ji vê Xwedê Tamisu û çemê Dîcleyê çêdibin. Alalu direve asîmên. Hedîseyeke wilo, lê ji yê huriyan kevintir jî li Babîlonê heye. Ew jî, dema ew seremoniyên sersala xwe pîroz dikin.

Dibe ku wate û awayê efsaneyan ji gelekî biçin gelekî din, lê piranî li gorî zimên tê guherîn. Çawa dibe bila bibe lêkolînên zanistî bingeheke rast û bihêz dixwaze. Îcar mîtolojiya kurdan heye ku me hê venekiriye. Mînak di mîtolojiya kurdan de Haoma (Xwedê) cihekî girîng digire. Di ayînên Zend Avesta de Haoma kesekî mîstîk, dîndar û dijminê mirinê ye. Kurdan, ew ji Zend Avestayê girtin di îslamê de kirin Xwedê (Haoma: dimilî).


**Çavkanî:**

1. John Pinset: Gresk Mytologi, 1982
2. Hesoid: Verker og Dager/ Skjoidet
3. Nicole Loraux: The Children of Athena, 1984
4. The Myth of the Goddess, Barring and Cashford, 1993
5. Martin P. Niisson: The Minoan– Mycenaen Religion, 1927
6. Elrik Vandvik: Blant Gudar pa Olymp, 1963
7. H. Ludin Jansen: Religionen i det gamle Hellas, 1974


MEMO DARRÊZ



Nivîskarê Welatê Me Faysal Dağlı û Ezîz Akreyî bi hev re.

NIVÎSKAR Û RÊZANÊ PÎR EZÎZ AKREYÎ JI BO WELATÊ ME XEBER DA:

# TA EM ÎNSANÊN XWE NEGUHERÎNIN RIZGARBÛNA ME PIR BIZEHMET E

**Pêşeroja me baş e. Ev sê hezar sal in civaka me di bin dagirkeriyê de ye. Însanên me kole ne. Lê heya em însanên xwe neguherînin, şexsiyeta miletê xwe durist nekin, rizgarbûna me gelek bizehmet e. Nexweşîna me paşketina însanên me ye. Vê nexweşînê lazim e em rehet bikin.**

**Hûn bi piranî di nava gel de bi aliyê xwe yî siyasî û leşkerî tên naskirin, lê xebata we ya çandî û nivîskarî jî gelek bi pêş ketiye. Em dixwazin hûn ji xwendevanên me re behsa van xebatên xwe bikin.**

– Xebata min a li ser çand û ziman li hemberî tahrîpkirina zimanê kurdî şîn bû. Min di sala 1958'an de dest bi xebata rewşenbîriyê kir. Di nava van salan de, min 13 pirtûk amade kirin. Ji van a muhîm "Ferhenga Erebî– Kurdî" ye, ev 3582 rûpel e. Ferhengoyeke "Îngilîzî– Kurdî" jî heye, ev jî teqrîben 2800 rûpel e. Ev herdu ferheng ji bo çapbûnê hazir in. Pirtûkeke din, "Pend û Şîretên Mezin û Zana", di vê pirtûkê de nêzîkî 4200 pend û metelok hene. Ên din: Nivîsana Kurdî bi Latînî, Giyana Mirovî û Navên Nexweşiyan (ev pirtûk li Bexdayê ji aliyê Akademiya Kurdî ve hat çapkirin û bi sê zimanan e), Rêbera Sê Zimanan (erebî, kurdî û îngilîzî), Navên Kurdî, Çîrokên Folklorî (4 pirtûk, her yek 16 çîrok), Dîrok û Tevgera Rizgariya Kurdan. A dawî jî li ser Başûra Mezin e; Başûra Mezin û Zûrekvaniya Hêzên Tarî û Ronahiyê.

Min ji aliyê xwe ve, heta ji dest bê vecbê li hemberî gel eda kiriye, lê van pirtûkan pirî wan nehatiye çapkirin, ev jî wezîfeya hizbên kurdî ye. Heta niha sê pirtûkên min çap bûne; Rebera Sê Zimanan, ev ji aliyê Hizba Şûî ve, Navên Nexweşiyan, ev ji aliyê Akademiya Kurdî ve û Çîrokên Partîzanî jî, ji aliyê PKK'ê ve hatin çapkirin.

**Piştî vî salî, emrê we wefa bide hûn dixwazin li ser çi bixebitin, di xeyalên we de çi heye?**

– Bi rastî ji sala 1958'an bi vir de, heya îro me xebat kir. Wextê şer jî me xebat dikir. Lê encam ew bû ku pirtûkên me tev di sindoqan de man. Me dixwest ku bikevin destên milet, lê îmkan nebû. Teb'en ev li ser nivîskaran tesîrê dike û rexbetên wî jî bere bere kêm dibe. Ev ji bo milet zirar e. Herekên (tevgerên) kurdî nivîskarên kurd tercîh nakin.

**Sebebên vê çi ye?**

– Sebeb şexsiyeta kêm e.

**Şexsiyeta eşîrî...**

– Teb'en, dinya bi ilmî diçe, ziman jî beşekî ilmî ye. Lê îtîmam nedan. Lê niha partî heye, Partiya Karkerên Kur-

## JIYANA EZÎZ AKREYÎ

Di sala 1924'an de li Behdînanê li bajarê Akreyê hatiye dinyayê. Bi gotina wî, "ji ber ku fikra wî ya neteweyî tund bûye, ji bo xizmeta milet" diçe dibistana leşkeriyê. Wê çaxê dema Melîk Feysel, sal 1941 e. Piştî qedandina dibistanê dibe zabit. Di 1954'an de jî dest bi Kulliya leşkeriya Erkan dike. Li sala 1962'an dest ji cehşên Iraqê berdide û daxilî nava şoreşa pêşmergeyan dibe. Di nava PDK'ê de dibe mesûlê Liqa Kerkûkê ya Leşkerî. Akreyî di sala 1957'an de bû endamê PDK'ê. Wê demê bi dizî di nava hereketa kurdî de dixebitî. Di sala 1964'an de bû endamê Lijneya Merkezî. Di 68'an de jî bûye endamê Mekteba Siyasî.
Di sala 1972'an de careke din fetilî nava ceşê Iraqê. Piştî sala 1974'an, ku peymana di navbera Bexda û kurdan xerab bû jî, ew li Bexdayê ma. Sekinîna xwe ya li Bexdayê, bi tewşiyên Mele Mistefa Berzanî îzah dike. Heta sala 1980'an di hikûmeta Bexdayê de Wezîriya Dewletê kir. Di sala 80'an de li Sûrî bû penahende. Ev sal çû Kurdistana Rojhilatê kete nava Partiya Sosyalîst a Kurdistanê. Lê ew sal dîsa ji wan veqetiya û xwe da xebata rewşenbîriyê. Heta sala 1991'ê yanî heta Serhildana Başûr li Swîsre (Îsviçre)yê ma. Piştî vegera welêt PKK nas kir û bi wan re ket têkiliyê. Heta sala 1993'yan li Xakûrkê di nava gerîlayên ARGK'ê de ma. Piştî re çû ba serokatiya PKK'ê. Ji bo çapkirin û amadekirina pirtûk û xebatên xwe yên siyasî di dawiya 94'an de derket Ewrûpayê.



**Rêxistinên Başûrê Kurdistanê bi metodên eşîretan şer dikin.**

distanê, pir pêşketî ye. Girîngî dide xebata rewşenbîrî, ev jî tiştekî gelek baş e, tê de meslehetа milet heye, xizmeta milet tê de heye.

**Li gorî dîtina we, di nava çand û zimanê kurdî de mirov bi çi awayî kare nêzîkayiyê deyne û cudabûnê ji holê rake, di vî bereyî de yekîtiyê ava bike?**

– Yekîtî bi qiseyannabe. Di vê qonaxê de gelek zehmet e. Yekgirtina zimanê kurdî ku zimanekî neteweyî ye, ez amelî nabînim. Di vê qonaxê de gelek bizehmet e. Heta dewleta Kurdistanê çênebe, nabe. Dewlet çêbû, wê akademiya kurdî hebe, zimanzanê kurd wê bixebitin, li Kurdistanê belav bibin, folklorê kom bikin û rêzimaneke zimanekî fermî pêk bînin. Ferhengeke ilmî bi raya parlamentoya Kurdistan bêlav bibe li ser hemû deveran. Me heta dewlet nebe ev çênabe.

**Niha zimanê kurdî bi sê alfabeyan tê nivîsandin, li gorî raya we kîjan ji bo zimanê me musaît e?**

– Çawa dagirkeran hemû tişt li ser me ferz kirine, ev alfabeyan jî li ser me ferz kirine. Ziman alaqe nîn e bi siyasetê re, ziman lefz e, lehçe ye. Ji ber ku zimanê me zimanekî Hind û Ewrûpî ye, baştirîn tişt wekî van Ewrûpiyan latînî bi kar bînin. Herfên erebî qet zeptên lefzên kurdî nake.

**Ji bo rizgariyê hûn pêşerojê çawa dibînin, rizgarî ji bo kurdan wekî berê xeyaleke dûr tê xuyan, hêviya we çi ye?**

– Pêşerojê baş dibînim. Ev sê hezar sal in ku civaka me di bin dagirkeriyê de ye, însanên me yên kurd kole ne. Lê heya em însanên xwe neguherînin, şexsiyetên miletên xwe durist nekin rizgarbûna me gelek zehmet e. Nexweşîna me, paşketina însanên kurd e. Vê nexweşiyê lazim e em rehet bikin.

**Wê çawa ev bê rehetkirin?**

– Bi xebata siyasî. Ev xebat niha tê kirin, hedefa xwe ya esasî kiriye gorîna şexsiyeta însanên kurd ên paşketî. Çawa doktor nexweşiyê teşhîs dike û li gorî wî derman dide, ev jî eynî tişt e. Muşkîlata kurdan însanên kurd e. Ew jî dijmin li me wiha kiriye Em lazim e muqabilên wan vê nexweşiya xwe rehet bikin. Hîç riyên me yên din nîn in. Belê barê me giran e. Dagirker heye, ew tebeqa kurd dîsa mutefîq e li gel dagirkeran, mutefîq e li gel dewletên ecnebî, ku meslehetên wan li ser Kurdistanê heye. Eger wan însanên kurdî çêbin wan hemû bêdestûpê bimînin. Nikarin çi bikin, wê qaziya me hal bibe. Her ev e, ev nebe feyde nake. Ewqas sal e li Başûr her îtimadên wan li ser ecnebî bû, digotin wê ji bo me dewlet çêkin, walahî ecnebî çi zemanan ji bo me dewlet çênakin.

**Piştî vî emrî û piştî vê tecrûbeyê, wexta difetilî li Başûr dinêrî çi dibînî?**

– Li Başûr ev xebata ku heta niha bûye, wexta 1961'ê ku me tecrûbe tê da ye ev xebat, ev siyaseta îslahî ku li ser diçîtin hîç îhtîmalekê nadin însanên kurd bi pêş bikevin. Her hema eleqatên wan li ser dewletên dagirker e. Niha dibêjin hikûmetek federal heye. Lê ew federaleke şeklî ye. Heta niha qanûnek çênekirin ku raya milet tê de be. Qanûn ji bo xwe çêkirin, ji bo meslehetên xwe yên hizbî. Ew qiyadên feodalî û burjûwazî temsîla milet nakin. Wekî din ev federalî şerî jî nîn e, ku şerî bûna, lazim bû li gel hikûmeta merkezî îtifaqê bike. Ne dewleta merkezî ev federaliya îtiraf kiriye û ne dewletên ecnebî, kesî îtiraf li federaliyê nekiriye.

**Paşê, wê qedera Başûr çawa biguhere?**

– Başûr heya di destê van herekeyên siyasî de be, di van herekeyên islahî de be wê wekî xwe be.

**Yanî girîng e, serokatî bê guhertin?**

– Tenê ne serokatî. Lazim e ev hereke bihele, xebateke nû çêbibe. Yanî ev hereke ku niha li Başûrê Biçûk heye, li Bakur heye lazim e têkeve Başûrê Mezin jî. Başqe çi rê nîn e. Hezar car Kurdistanê çêkin bêfeyde ye. Her wekî me got, yekgirtin bi qise nabe, ji bo yekgirtinê şexsiyeteke nû lazim e. Mesela Celal û Mesut herdu jî bi hev yariyan dikin. Kes bawerî bi yê dî nîn e. Çunkî meslehetên milet nabêjin, ji bo meslehetên xwe kar dikin. Ji Sala 1961'î heta niha van herdu cihetan miletê me yê Başûr, ku baştirên milet bû, musehî bû, welatparêz bû, lê xerab kirin. Wan milet kirin, bi wan re bawerî nehiştin. Şerê birakujiyê, tê zanîn. Wan dewletên din dixwest birakujiyê bikin. Eger dewleta wan a federal efendî heye ji bo çi şerê birakujî dikin?

**Heta meslehetên xwe yên hizbî nedin paşiya meslehetên milet, hûn dibêjin wê şerê birakujiyê hebe?**

– Heta ew hebin, wê tim birakujî hebe. Bila hezar îtifaqê jî bikin, min tecrûbe li gel wan heye, ji sala 1964'î heta îro, şerê wan neqediyaye. Car caran şerê wan radiweste jî ev tesîra dewletên xaricî ye. Bi Şah re, bi Xumeynî re, niha jî bi tirkan re bûnê ye, ev hemû ji bo meslehetê wan e, tu meslehetê qewmê kurdan ji qaziya kurd tê de nîn e.

**Der heqê herekeya Bakur û taqtîkên wê de tu çi difikirî? Li gorî dîtina we mirov dikare bibêje ku xelasî nêzîk e?**

– Dewleteke wekî Tirkiyeyê ku hemû îtimama Amerîka û Rojavayê li ser e, ku dewletek leşkerî ye, piştgiriya wan, alîkariya wan heye. Her sal bi milyonan dolaran têne xwedîkirin. Lê partî bi xebata xwe, di van salên kêm de, hemû deh sal e, ev nîzam xera kiriye. Tebîî, ev karekî mezin e. Li aliyê siyasî jî tu rê li ber Tirkiyeyê nemane, li gel Ewrûpayê tu rûyê wan nemaye. Ev pêşketina di bereyî kurd de, tebîî bi xebatê çêbûye. Ew berxwedanên gelî, pîreka kurd gihîştiye wê şexsiyetê ku dikare neftê li xwe bike, ji bo kurd û Kurdistanê dikare xwe bişewitîne.

**Baş e zêdeyî îrada kurdan, şertên herêmê, rêzaniya dagirkeran û rewşa rojhilatê wê dest bide ku hereketa kurd riyeke nû veke û were merhaleyeke nû?**

– Wê rê veke, her wekî me got; partî girîngiyê dide şexsiyeteke nû. Ev muhîm e, esasê qeziya kurdî ev e. Serok Apo her roj sê çar saetan bi vê mewzûyê re, yanê bi mewzûya guherandina şexsiyeta însanên kurd re eleqedar e. Qiyade jî, hemû bi vê mewzûyê re meşgûl in. Tebîî, qaziya me ya Bakur jî bi vê rewşê bi pêş ketiye. Başûrê Biçûk dîsa bi pêş ketiye. Her wiha ber bi Başûrê Mezin û Rojhilat ve diçe. lê xebat nisbî ye, hemû ne wekî hev in. Qaziya kurdî hemû bi yek qonaxê hel nabe. Dibe ku serxwebûna Kurdistanê qonax bi qonax be.

**Li ser dîplomasiya kurdan mirov dikare çi bibêje?**

– Çend salan ez li gel Mele Mustefa bûm. Çi carekê bi awayekî resmî muazefekî dewleteke ecnebî nehat gel wî û nepeyivî. Lê îro parlementên Ewrûpayê li ser mesela kurdî bi awayekî alenî û resmî dipeyivin. Ji ber ku ew dizanin heta meseleya kurd hel nebe, li şerqulewsad (Rojhilata Navîn), silh qet temîn nabe.

**Hevpeyvîn:**
**FAYSAL DAĞLI**

www.arsivakurd.org

Axîna Welat

## Dengê kurdên Rûsyayê

Bi armanca danasîna tevgera rizgariya neteweyî ya kurdan li Sovyeta berê û xurtbûna yekîtiya neteweyî ya kurdan, ji aliyê pênc rojnamevanên wekî;Ezîzê Cewo, Bavê Nazê, Hejar, Çerkezê Reş û Ehmed Botan hejmara 1'emîn ya rojnameya Axîna Welat di roja 30.1.1995'an de derket. Axîna Welat rojnameyeke çandî û sîyasî ye. Ji 15 roj carekê li Moskovê tê weşandin. Rojname, 16 rûpel an pêk hatiye., ji wan 12 rûpel bi zimanê Kurdî û 4 rûpel jî bi zimanê rûsî ne.

Di hejmara Axîna Welat ya yekemîn de ev nivîs balê dikişinin; Mesaja Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ya ku ji Konfederasyona Kurdên Moskovê re şandibû û bersivên delegeyan. Dîsa nivîsa Gerînendeyê Weşanê, li ser mijara pisgirêkê kurdên li Rûsyayê dijîn û hwd.

**Welatê Me/Berlîn**

## Komeleya nivîskarên kurd li Swêdê

Gelek nivîskarên kurd ên ku li Swêdê dimînin, demek berê dest bi xebata xweorganîzekirinê kiribûn. Nivîskarên kurd di çend civînan de pirsên xwe munaqeşe kirin û di 22.1.1995'an de bi kongreya damezirandinê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê damezirandin.

Li ser pêşniyarên beşdaran, kongre ji bo sekinandina şerê navxwe yê Kurdistana Başûr û ji bo protestokirina tade û neheqiyên ku li Tirkiyeyê li nivîskar Yaşar Kemal dibin, du beyanname belav kirin. Herwiha kongreyê qerar da ku ji aliyê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê ve kovarek bê weşandin.

Di kongreyê de ev kes ji bo komîteya kargêr a Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê hatin bijartin:

Naci Kutlay
M. Malmîsanij
Munzur Çem
Ahmet Cantekin
Nedim Dağdeviren
Osman Aytar
Mahmûd Lewendî

**Dewlet ji bo ku gerîlayên PKK'ê bêerzak bimîne ambargoyê wek sîlah bi kar tîne**

# Li hemberî gerîlayên PKK'ê ambargoya dewletê

Ev hefte li gelek deweran hêzên dewletê operasyonên xwe sekinandin. Ambargoya li ser gundan roj bi roj dijwar dibe. Dîsa vê heftiyê jî gelek êrîşên gerîlayan û şer çêbûn. Di van bûyeran degelek leşker û gerîla mirin.



**27.1.1995**

Di navbera gundê Misircê, Siya û Livsor de gerîlayên ARGK'ê êrîşî leşkeran kir. Di êrîşa gerîlayan de gelek leşker mirin û birîndar bûn.

Li Licê, li gundê Dekanê, roja 24'ê rêbendanê 4 gerîlayên ku hatibûn kuştin, ji aliyê leşkeran ve li taxên Licêyê bi tereqtorê hatin gerandin û teşhîrkirin. Li gorî agahiyên ku ketin destê me, cesedên gerîlayan nedihatin naskirin.

Gundê Dersim û Çewlikê yên hêj nehatine şewtandin û necerdevan in di bin ambargoya dewletê de ne.

Greva birçîbûnê li Girtîgeha Bucayê kete roja 38'an, li Girtîgeha Aydinê kete roja 28'an.

**28.1.1995**

Di navbera Madenê û Erxenê de, gerîlayan û leşkeran şer kir. Di şer de 3 leşker mirin, gelek jî birîndar bûn.

Cerdevanên dora Bismilê, biunîformayê gerîlayan diavhejin ser gundan û faaliyetên kontrayan li dar dixin.

Li Cizîrê hêzar (çarşef) hate qedexe kirin. Biryara qedexe kirina hêzarê ji aliyê Emnîyeta Cizîrê hatiye standin.

Li Girtîgeha Bucayê û Aydınê greva birçîbûnê didome.

Serokê MHP'ya Sêrtê, bi leşker û cerdevanan re dertê operasyonan û birayên xwe ve li gundiyan pêkutiyê dikin.

**29.1.1995**

Kesek binavê Abdullah Eren li Şernexê piştî binçav kirina hêzên dewletê, di navbera Nisêbîn û Koserê de mirî hate dîtin.

Li navçeya Amedê, li Farqînê, leşkerên Alaya 10'emîn yê bêlûka 3'yemîn boykota xwarinê kirin.

Di navbera Pasûr, Licê û Farqînê de gerîlayên ARGK'ê cerdî leşkeran kir. Di cerda gerîlayan de uzman çavuşek û 3 leşker mirin, serbazek û 10 leşker û 3 cerdevan birîndar bûn.

Di operasyona hêzên dewletê ya li çiyayê Amanosê (Çukurova) de gerîlayên ARGK'ê 4 faşistên sivîl kuştin. Çapemeniya tirk ew wekî nêçîrvanan da nasîn.

**30.1.1995**

Di çola Hênê de, gerîlayan leşker xistin kemîna xwe. Di kemîna gerîlayan de 2 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn.

Li mintîqeya Omeryanê, li dora gundê Qurika, Bihirî û Cibilgiravê hêzên dewletê 23'yê rêbendanê operasyon li dar xistin. Ji wan gundan 4 gundî windan e. Gundiyek (72 ) ji aliyên hêzên dewletê ve hate kuştin.

Gerîlayek li Wêranşarê bi hêzên dewletê re kete şer. Di şerde timekî taybet û polîsek birîndar bûn, gerîla piştî guleyên wî qediyan xwe kuşt.

**31.1.1995**

Li Pirîn (Semsûr) û navçeyên wê, hêzên dewletê 40 kesî girtin û xistin binçav. Operasyon didomin.

Gerîlayan êrîşî gundê Xerbelûs ya Xêzxêra Êlihê kir. Di cerda gerîlayan de gelek cerdevan mirin û birîndar bûn. Di eynî şerî de gerîlayan 2 erebeyên leşkerî jî wêran kirin. Der heqê mirî û birîndaran de saloxî nîn e.

Tîmên taybet li Çewlikê (Bîngolê) erebeyekê gulebaran kirin. Yek mir, yek jî birîndar bû.

Li Cizîrê, li Tabûra Darayê yuzbaşiyekî bi sîlehê bînbaşiyek birîndar kir. Birîna bînbaşî xedar e.

Leşkerek li Farqînê li Alaya 10'mîn, ji ber pêkutiyên serbazan xwe kuşt.

Greva birçîbûnê ya Girtîgeha Bucayê û Aydınê didome.

**1.2.1995**

Li çola Pasûrê, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di şer de gelek leşker mirin û birîndar bûn.

Serokê Komîsyona Dîsîplînê ya HADEP'a Êlihê hate kuştin. Tê gotin ku qatilê wî endamên kontrgerîla ne.

Gundî, li dora Sêwirekê ji ber cerd û pêkutiyê cerdevanên Bucakan nobet digirin.

Li Girtîgeha Bucayê, greva birçîbûnê kete roja 44'an. Li Girtîgeha Aydînê kete roja 34'an.

**Navenda Nûçeyan**

## Lawanî başûr, dûr le welat

Mêjûy derçûnî kurd le başûr ewe berew Erupa zor kon niye, belku degerêtewe bo salî şestekan û ew demane xelkêkî zor kem le derewe bûn, belam diway hereshênanî şoreşî gelî kurd le salî 1975, be sedan xêzan û mirovî selt ke rastewxo le xebat da beşdar bûn rûyan le henderan kird, le ber ewey baweryan be rijêmî baas nebû û neyanxwast bênewe jêr sayey ew rijêm e. Be hoy tund û tîjî dewletî Iraq ewe, ew core kesaney derewe le naw gel da ewende basyan lêwe nedekra.

Legel helgîrsanî şerî nêwan Iraq û Iran da jimarey derçuwan bo derey Kurdistan ziyadî kird be corê ke legel kotahatinî Enfalekan da be deyan hezar nêzan û gelte belam le welatanî dewrûber û rojawa wekû penahinde cêgîr bûn.

Diway serheldanî beharî salî 1991, gel way çawerwan dekird ke ewaney le derewen êdî degerênewe Kurdistan çûnke hoy bûnî ewan le henderan deselatdarêtî rijêmî baas bû le Kurdistan, belam ew boçûn e nehate dî, lawan û xêzanekan ziyatir helhatin, zor sedem bûn be hoy ew koç kirdin e, le layek ewe Kurdistan û Iraq kewtine jêr gemaroy abûrî tundî NY ewe, bemeş helawsan (inflasiyan) ziyadî kird û dinarî Iraqî behay xoy le dest da, gel bê kar û kasibî manewe, ne hukumet û ne parlemanî Kurdistanî fedralî be hoy milmilanêy tesk û tengî partayetî yewe neyan tiwanî çarî rewşî xerabî abûrî û barî têkçûy asayiş biken. Le layekî tir ewe, ew kurdaney be pêştir çûbûne derewe, lew bê karî û tengasî ye da dehatinewe Kurdistan û be rast û be çep da pereyan pexiş dekird, ger caran dolarêk çend sed tilisêk bûbê, ewa êsta be hoy helawsan ewe be deyan dînar e.

Hendêk le ewane ew samaneyan be rencî şan peyda kirdibû, belam hî wa hebû be nawî kurd ewe koy kirdbowe û bo xoy destî be ser da girtibû, emane le katî hatineweyan da bo Kurdistan wayan nîşan deda ke Eurupa û rojawa beheştî xwdê ne, ew çermeserî û derd û azarey beseryan hatibû, basyan lê ewe nedekird, emane wayan le lawî bêçarey başûrî kird ke kelkeley sefer bikewête seryan.

Be deyan hezar law û xêzan rûyan le henderan kird, wekû aşkira ye êsta her dewletê be asanî mafî penahindeyî nadat, boye êsta çendîn law û xêzan le metropolekanî Turkiya û le welatanî tirî Eurupa aare û sergerdan in, le cade û kolanekan roj dekenewe, hendêk lew lawane rewiştî wa denwênin ke piyaw pêy şerm e bîhênête ziman emane be carêk xû û rewiştî kurdaneyan xistote jêr pê we.

De ey lawanî serbilindî kurd welatî xotan cê mehêlin derz û pend lewaney derewe werbigrin, ew kesane riswa biken ke Eurupa û rojawa be beheşt deşubhênin, ewane dekrê be xayinî niştîman naw bibrên.

**BEKİR BAHOZ**

## DI WÊJEYA RÛSÎ DE NAVEKÎ MEZIN

# Vladimir Mayakovsky



**Vladimir Mayakovsky (1893–1930)**

Ji niha û 80 salan berê ji murekeba pênûsa Vladimir Mayakovsky (1893–1930) gotinên jorîn dirijandin. Lê, Mayakovsky ji bo civaka kurd biyan e. Li vir armanc ne li ser jiyana wî sekinîn e, lê li dora helbestên wî gerînek e. Mayakovsky li du guherînan e. Di zimanê lîteraturê de guherînan dixwaze. Heger mirov li ruha helbestê binêre wekî serîrakirinekê ye, li dijî elîtê ku ziman kiriye bin destê xwe, li gorî xwe pê dileyîze. Lê, ji vî zimanî jî bê wan kesek fêm nake. Jixwe di destpêkirinê de bangî wan dike. "Hûn"dibêje. Bi armanca "Hûn" elîtên civatê ne. Elîtên ku xwe zana dihesibînin, lê li gorî wî xwedî ruhekî tarî û ne vekirî ne. Ruhê ku gel jê fêm nake. Wekî din ev çawa dikare bê şîrovekirin: "Ruhê min ne girtî ye." Daxwaza wî ew e ku ziman bibe zimanê rojane, yê civatê, yê gel, yê mirovên kolanê, yê şivan û gavanan. Ne bi tenê yê ronakbîran. Awaya ku ronakbîr zimên bi kar tînin wekî diziyê dibîne. Dixwaze zimanê wî bibe zimanê metelokan, yê gotinên pêşîyan. Daxwaza wî ev e: "Ez ji dikarim bi sextekariyê bibim navdar, lê ew ne riya min e."

Di helbestê de mesajeke polîtîk heye. Di tekoşîna nava çînên bindest û serdestan de ew raste rast cihê xwe eşkere dike û bi pênûsa xwe jî gefan li serdestan dixwe. Di van rêzan de li dijî jiyana wan, hunerê wan derbên xedar hene: "Gelê deusan bigrin bajarên wekî Nice, bi rihetiya xwe!... "Ên ku di nava rihetiyê de dijîn kî ne?

Helbet desthilatdarên ku civatê bi rê ve dibin û berdestikên wan elîtên ku tilîyên wan pênûsê digirin in. Helbesta Mayakovsky rasterast ji rewşa dema ku ew tê de dijî re neynikek e. Di wê demê de li Rûsyayê di nava çînan de cudabûneke mezin heye û ew di her warî de şopa xwe dide diyar kirin. Civat bi rişwetan ve tê celiqandin. Desthilatdaran kiriye ku li qaîde û qanûnan nenêrin. Ilm û zanînê wekî miras û malê xwe dibînin. Yên ku bixwazin behsa zanînê bikin, pê tinazan dikin. Mayakovsky ji vê para xwe distîne ku bi tevahiya hêza xwe li hember serî hildide. Bi serîhildana xwe ya ruhî jî şexsiyeta xwe ya neşikestî dide nîşan. Şexsiyeta "Ez" ku di helbestê de tê bikaranîn ne jihevketî ye, li hemberî tu quwetan serî natewîne, zinde ye ,wekî ku dinya gişt ya wî be. "Her çend em, xizan ji aliyê fîzîkî ve ne baş xuya bibin, xwarina me kêm be jî, hundirê me dewlemend e. Ew me rind û geş dike. Jiyana me, awayê ku em dijîn renge rengîn e. Her çend hûn di dewlemendiyê de bijîn jî, ruhê we xizan e", dixwaze bibêje Mayakovsky, bi vî awayî dibêje: "Ez 22 salî, xortekî ciwan im." Di helbestên wî de mirov hem îroniyeke giran (bixwetinazkirin) hem jî têkiliyên wî yên bi gerdûnê re dibîne. "ez bi dengê xwe gerdûnê tije dikim." Li vir nepixandineke mezin heye ku ew jî ji toreya rûsan tê. Xwemezinkirin, pesndayîn. Jixwe di helbestê de seranser hestên nepixandî hene, lê daxwaza wî ya guherînê mezin e. Ji bo vê jî dewlemend û serdestan bi zimanekî erzan wekî "dîwanê lewitî" provoke dike. Ziman, gotin û îfade bi awayekî mecazî tên lihevkirin.

**MEMO DARRÊZ**

### DI ŞALAN DE EWREK (1914–1915)

Ramana We ya birûmet
dişibe xizanekî zexel û dirêjbûyî
di dîwarekî lewitî de.
Ew dihizire: "Ez qet jî ne di halekî neçê de me !"
Ramana we ez dixwazim gij bikim bi dilê
xwe– paçikekî bixwîn.
Der barê min de mirovine dibêjin:Ew qeşmer e,
bi tenê wekî şeytên.
Di ruhê min de tu mûyekî boz tune ku
pê şermazar bibim!
Ruhê min ne girtî ye (ji umûmê re).
Ez bixwe, gerdûnê bi dengê xwe tije dikim.
Di 22 saliya xwe de xortekî ciwan im,
lê bi jiyaneke watedar û dewlemend.

Ji bo rind ruhgirtiyan evîn wekî fiyolînekî ye,
lê ji bo keriyên mirovan, ji bo adî û erzanan,
ew def û dinbilik e.
Ez bi şewatê dijîm û bi rastî jî ne rind im.
Lê dizanim evîn dê çawa be!
(Ew)Bi tenê der barê Xanima biseh de
hînbûn e.
Hûn bawer bikin ku Hûn jêhatî ne
û hatine hînkirin. Na! Hûn
her tiştî nizanin, lê Hûn divê,
wekî aşvanekî, rûpelên pirtûka êş biçerixînin.

Heger hinek wê bixwazin,
dikarim bibim berazek.
Lê heger hinek car din wê bixwazin,
dikarim ez, bêdizînê bibim bijarteyekî baş
–ne mêr, lê di şalan de ewrek!
Gelê deusan/şeytanan bigirin bajarên wekî
Nice bi luksusa xwe!
Ez li ser asîmên nanivîsim, lê bi zimanê erdê.
Diwazim ku helbestên min bibin malên hunerê
ku bên bikaranîn,
û behsa jinan û mêran bikin, bên xebitandin
wekî metelokan!"

**Wergera ji norwecî Memo Darrêz**

# DEFTER

## Pêwistiya parlamentoya kurd




**AMED TÎGRÎS**

Îro tevgera rizgariya neteweyî ya Kurdistanê gihîştiye sewiyeyeke herî bilind. Rewş îro wiha ye ku hejmara gerîla di navbera 30–40 hezarî de ye. Hem li welat û hem jî li derî welat gelek dem û dezgehên civakî, kulturî û siyasî hatine çêkirin. Di vî warî de gelek komele, federasyon, konfederasyon, enstîtu, akademî û yekîtiyên kurdan hene. Eniya rizgariya neteweyî di nava xwe de bi milyonan gel bi madî û manewî xistine nava têkoşînê. Bi sedhezaran kes beşdarî meş, mitîng û xwepêşandanan dibin.

Bi vê xebata şoreşgera modern û mîlîtan, ji aliyekî ve dewleta tirk ketiye krîzeke kûr û mezin û ji aliyê din ve doz û pirsa kurd ketiye rojeva navneteweyî. Kurd, êdî li gorî rewşa xwe ya nû xebatên dîplomasiyê di sewiyeyeke bilind û merkezî de bimeşînin. Bi gotineke din pêwist e ku kurd dezgehên xwe yên dewletê ava bikin. Ev jî avakirina parlamentoya Kurdistanî ye. Avakirina hikûmeteke kurd e. Ev pêwist in. Di vî warî de, ev ji demeke dûr ve ye ku li Ewrûpayê xebata damezirandina Parlamentoya Kurd a li Sirgûnê tê kirin. Ji 23 kes û nûnerên gelek dem û dezgehên neteweyî, demokratîk û siyasî wekî ERNK, YRWK, Enstîtu, parlamenter û serokên belediyeyên DEP'ê yên li sirgûnê, yekîtiyên alewiyan, êzidiyan, Tevgera Îslamî, rêxistinên asûriyan û kesên serbixwe komîteyeke amadekar ji bo avakirina parlamentoya kurd li sirgûnê hatiye çêkirin. Komîteya amadekar, di 25'ê meha yekê de civîna xwe ya sisiyan çêkir. Komîteyê karûbarên xwe nirxandin û planeke nû çêkir. Komîteyê giranî da ser karûbarên rêxistinî, lêkolînî, têkiliyên der û hundir, teknîkî û hilbijartinê. Ew hewl dide ku tu rêxistin û hêzên Kurdistanî li derveyî parlementoyê nemînin. Ji her aliyî ve parlamento rengîn û zengîn be. Di nava wê de îktîdar û muxalefet hebe ku demokratîk û neteweyî be. Avakirina parlamentoya Kurdistanê li sirgûnê gaveke dîrokî ye. Wezîfeyeke neteweyî ye. Divê her rêxistina Kurdistanî û kesê Kurdistanî, wezîfeyê xwe baş bizanibe û bi cih bîne. Neteweyî û demokratîk bifikire. Helwest bigire. Yên ku îro wezîfe û berpirsiyariyên xwe yên neteweyî û demokratîk bi cih neyînin, sibehê dê li ba gel tawanbar û sûcdar derkevin. Hinek bûyer û pêngavên dîrokî hene ku dema mirov li wan xwedî dernekeve û neparêze, dîrok mirov efû nake.

Çîrok

# PÛT



"Ê.. Ezê çawan bikim? Heger ez vegerim malê (ez) dizanim xelk wê li ser min çi bibêje:

– Hûn dizanin Hemreşê îro zarokên xwe bênan hiştine. Qet kezeb bi te re tunebû malneketo?

"Bi xwedê ezê bibim benîşt di devan de. Na, na ez venagerim." got û Ji ser pişta kerê xwe peya bû. Çend gav avêtin, lê gêran berdil kirin;

– Law tu nizanî rewş bûye çi gû? Ma tu mirî yî ha ji te re çend kîlo nan?

Kute kute dil bilind bû, kab sist bûn. Di cih de rawestiya, careke din çavên xwe mist dan û li wê reşaniyê nêrî:

– Na tu ne şaş î. Ji sedî sed ev kesek e û rê li pêş te girêdaye. Hîn Xwedê dizane ku çend heval jî pê re bin. Hî, hî.. Law te xwe kî dîtiye ku rê jî li pêş te girêdin? Bimeş, bimeş û van gotinên vala ji serê xwe biavêje.

Du sê gav avêtin, lê vê carê çavên kerê li komek fişqî ketin. Serê xwe daxist ser û nema dimeşe. Hemreş bi vî karê kerê di hundirê xwe de hinekî kêfxweş bû,. Ramanên har dîsa êrîşî serê wî kirin:

– Rast e, dijminên te nîn in. Lê dîno rûpela kesekî spî maye li vê deverê?! Ger tu ne di vê partiyê de bî, tu di ya dîn de bî. Te xwest an na û partiyên me jî xwedê bihêle pir in. Zarokên me vê yekê baş dizanin, rewşa me neynikeke şikestiye kuro. Me destên xwe ji her tiştê rind kişandine û em şerê hev din dikin. Çîrokan li ser hev peyde dikin. Ne wilo ye?! Bûyerên dawîn mîna wêneyên tijî tirs di pêş çavên Hemreş re derbas bûn:

– Eho li gundê "Bûkê" kuştin, Memo li "Sêrtê" kor kirin...Şêxo...Cimo... Bêyî ku kes bipirse: "çima?" Ev çi demeke çilmisî ye lo...Hîn em bi vî devî her roj li ser Kurdistanê dipeyivin. Ma ne bapîrên me ji berê ve gotine: "Mirîşka kor di xewnê de gênim dibîne."

Ji nişkê ve kerê serî hilda û zirî. Di cih de ramanên wi pûç bûn. Dengê zirînê bi ber deştê ket, saweke tûj xiste dilê Hemreş. Wî kir ku kerê bêdeng bike, lê kerê serhişk bi ya xwe kir. Careke din ber bi reşahiyê ve nêrî. Mat ma:

– Ma vî teresî nebihîst? Ne xwe livand û ne jî şivand.

Hiş di serê Hemreşê de bû pelûl, nema dizane çi bike. Piştî hevpeyvîneke dirêj bi xwe re, biryareke serjêkirî stand. Hefsarê kerê xwe kişand. Da li cihekî dûrî rê, raweste, heya roniya sibehê bide der.

Ji ber ku nangeh li gundê Hemreşê nîn e, ew her serê çend rojan carekê di berbangê de hişyar dibe. Berê xwe dide şema da ku zû bigihe nangehê û nên biqedîne. Lê îro ne wek her carî bû. Beriya ku dergehê şemayê bikute, di mêrantiya sibehê de reşahiyek ferq kir. Mîna çîroka "Etarê Dimis" lê hat, ne kare vegere û ne jî here.

Bi hişyarbûna roniya sibehê û dengê çivîkan re, ewrê tirsê li ser dilê Hemreş vekişiyan. Ji nû ve li kerê xwe siwar bû û bi rê ket.

Bi her gavekê ew reşahî nêzîktir dibû.

AWAZ KALO

## "Mîrate"ya Lîstikan


Ev navê kitêba Zeynelabidîn Zinar e ku li ser leyistikên kurdî hatiye nivîsandin. Nivîskar jixwe bi xebatên li ser berhevkirina zargotinên kurdî û wergera berhemên klasîk ên kurdî li alfabeya latînî ya kurdî, tê naskirin.

Di warê berhevkirina zargotinên kurdî de li seriya 14'an kitêbên wî hene.

Zeynelabidîn Zinar di vê "Mîrate"yê de cih daye 45 leyistikan. Lê ew di du beşan de pêşkêş kirine. Di beşa "Leyistikên Zarûkan" de 32 û di beşa "Leyistikên mezinan" de 15 cure leyistik hene. Di beşa zarokan de mirov li "heftok", "kerik", "zirnezîq", "darqîtik", "tîr û kevan" û hwd. rast tê. Ji beşa mezinan jî ev leyistik dikarin bên dayîn: "sêberk, dam, sêgav, gog, bir, kevirê qewetê".

Nivîskar di "pêşgotin"a kitêbê de dibêje ku ji ber bêxwedîbûna çanda kurdî, wî nav lê kiriye "Mîrate" û her wiha bi tenê karibûye ji herêmeke Kurdistanê, "Reşkotan, Bişêrî û Xerzan" leyistikan berhev bike.

Pirtûk ji aliyê Weşanxaneya Çanda Kurdî ya Pencînarê, li Stockholmê di 1994'an de hatiye weşandin.



**Berga pirtûka "Mîrate"**

## "Tu ji me yî baş î; ne ji me yî ne baş î"


Kovara mehane Nûbihar bi vê sernivîsê derket. Di vê hejmara 27'an de, bi sergotara xwe Nûbihar dide zanîn ku heqîqet ne di binê îpoteka kesî de ye û divê ku terefgirî neyê kirin. Her wiha dide diyarkirin ku kesên ji mirov jî her tim rastiyê nabêjin û divê helwest li gorî "jimebûn û jimenebûn"ê neyên standin.

Nûbiharê di vê hejmara xwe de cih dayê helbest, gotar, çîrok û wergerên ji zimanên erebî, tirkî, farisî û bi zaravê lorî.

Heke ku em navê çend berhemên di vê hejmarê de bidin:

Sabah Kara "Mersiyeyên Rojhilat (Cegerxwîn)", Aqil Mihacir "Hovîtiya Hovan û Em", Azad Berîvanî "Bikaranîna Zimanê Kurdî", Ayhan Yekta "Netew û Pêşveçûna Ziman", Hüseyin Akar "Tenyayiş Mergo".

Süleyman Çevik "Şeş Pirs"a Bedîuzzeman ji tirkî, Seîd Norsî, Sabah Kara "Dubeytî"ya Baba Tahirê Uryan ji lorî, Bavê Xeca Zêrîn nivîsa "Pêşhatî ya Îslamê ye" ya Seyyid Qutub ji erebî wergerandine kurmancî.




**Berga Kovara "Nûbihar"**

# ANKETA XWENDEVANÊN WELATÊ ME

**Nav:**
..........................................

**Paşnav:**
..........................................

**Hûn çend salî ne:**
..........................................

**Tehsîla we:**
..........................................

**Karê we:**
..........................................

**Meaşê we:**
..........................................

**Hûn ji ku ne?**
..........................................

**Hûn niha li ku rûdinin?**
..........................................

**Hûn ji kengê ve bi kurdî dixwînin?**
..........................................

**Hûn çiqas bi kurdî dizanin?**
- Dixwînim
- Dinivîsim
- Hem dixwînim, hem dinivîsim

**Zimanê we yê zikmakî kîjan e?**
..........................................

**Hûn ji kengê ve bi kurdî dizanin?**
..........................................

**Hûn ji kengê ve bi kurdî dixwînin?**
..........................................

**Hûn ji kengê ve Welatê Me dixwînin?**
..........................................

**Hûn ji xeynî kurdî bi kîjan zimanên din dizanin?**
..........................................

**Hûn Welatê Me her hejmar dixwînin?**
- Erê
- Carina

**Hûn Welatê Me bi çi awayî (ji ku) distînin?**
..........................................

**(Ji bo kurdên ne li Kurdistanê dijîn)**
**Hûn ji ber çi sebeban derketine derveyî welêt?**
..........................................
..........................................

**Hûn zimanê rojnameyê çawa dibînin?**
- Hêsan (rehet)
- Dijwar (zor)

**Hûn kîjan rûpelên rojnameyê dixwînin?**
..........................................

***XWENDEVANÊN HÊJA***

Ji kerema xwe re vê anketa ku me amade kiriye, baş bixwînin û piştî ku we cewaba pirsên wê dan bêderengî ji me re bişînin. Di vê anketê de du texlît pirs hene. Yên li ku hemberî wan an jî li bin wan cihê bersivê vala ye ji bo dagirtinê we ye. Cureya duduyan jî pirsên ku li bin wan çend bersiv hene, divê hûn xêzekê bikişînin bin yekî an jî çend heban ji wan. Bi saya vê anketê, em difikirin ku li gorî daxwaz, hêvî û rexneyên we kêmasiyên rojnameyê ji holê rakin û ji bo rojnameyeke xweşiktir guherînên pêwist çêbikin. Berî guherînan emê netîceya anketê jî pêşkêşî we bikin. Piştî dagirtina anketan, hûn dikarin rûpela anketê bibirin an jî fotokopiya wê bikişînin û ji me re bi lezgînî bişînin.

**Hûn pêşî li kîjan rûpelan dinêrin?**
..........................................

**Hûn kîjan rûpelan qet naxwînin?**
..........................................

**Hûn bi kîjan zaravayên kurdî çiqas dizanin?**

**Kurmancî**
- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

**Kirdkî**
- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

**Soranî**
- Fêm dikim
- Dixwînim
- Dinivîsim

**Li gorî we zimanê kîjan nivîskarên Welatê Me hêsan e?**
..........................................
..........................................

**Bi dîtina we zimanê kîjan nivîskarên me dijwar (zor) e?**
..........................................
..........................................

**Hûn dixwazin di Welatê Me de kîjan nivîskarên din hebin?**
..........................................
..........................................

**Li gorî we zimanê nûçeyên me çawa ye?**
- Hêsan e
- Dijwar e
- Baş e

**Hûn dixwazin ku Welatê Me giş rengîn be?**
- Na, wisa baş e
- Na, divê tev reş û spî be
- Erê, gerek e tev rengîn bibe.

**Di rojnameyê de en zehf hûn kîjan nivîsan dixwînin?**
- Yên li ser zimên
- Yên li ser çand û hunerê
- Nivîsên quncikan
- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsên mîzahî
- Nameyên xwendevanan
- Fal
- Nivîsên zarokan
- Nûçeyên derve

**Ji van mijaran hûn kîjan qet naxwînin?**
- Yên li ser zimên
- Yên li ser çand û hunerê
- Nivîsên quncikan
- Nûçeyan
- Hevpeyvînan
- Nivîsên mîzahî
- Nameyên xwendevanan
- Fal
- Nivîsên zarokan
- Nûçeyên derve

**Hûn xaçepirsê çêdikin?**
- Tenê peyva veşarî dibînim
- Carina çêdikim
- Her tim çêdikim
- Qet çênakim

**Cihê em ji nameyên xwendevanan re vediqetînin;**
- Zehf e
- Hindik e
- Baş e

**Bi dîtina we zimanê Welatê Me bi giranî;**
- Yê Botan e
- Yê Xerzan e
- Yê Toran e
- Yê Serhedê ye
- Kurdistanî ye

**Hûn kîjan aliyên Welatê Me xurt (baş) dibînin?**
..........................................
..........................................

**Hûn kîjan aliyên Welatê Me qels dibînin?**
..........................................
..........................................

**Li gor we nivîsên Welatê Me;**
- Kurt in
- Dirêj in
- Baş in

**Di Welatê Me de nûçe (xeber)**
- Hindik in
- Zehf in
- Baş in

**Ji xeynî Welatê Me hûn kîjan weşanan (rojname û kovar) dixwînin?**
..........................................
..........................................

**Hûn kîjan weşanan diecibînin?**
..........................................
..........................................

**Welatê Me gerek e;**
- Dîsa hefteyî derkeve
- bibe rojane
- bibe duhefteyî
- bibe mehane

**Di Welatê Me de nivîsên bi kirdkî û soranî;**
- Hindik in
- Zehf in
- Bes in

**Hûn dixwazin ku di Welatê Me de êdî zehf kîjan mijar hebin?**
..........................................
..........................................

**Hûn siyaseta weşana Welatê Me çawa dibînin?**
..........................................
..........................................

**Di xwendina Welatê Me de çi tengasiyên we hene?**
..........................................
..........................................

**Hûn fiyeta rojnameyê çawa dibînin?**
- Erzan e
- Bibuha ye
- Baş e

**Ji xeynî we çend kesên din ji rojnameya ku hûn distînin, îstifade dikin?**
..........................................
..........................................

**Hûn rojnameyê ji maliyên xwe re dixwînin?**
- Erê
- Na
- Carinan

**Divê ferhengok di rojnameyê de;**
- Hebe
- Tune be
- Hebe û cihê wî firehtir be

**Dîtinên we yên din hebin li jêr binivîsin;**
..........................................
..........................................
..........................................
..........................................

www.arsivakurdi.org



## Ji Welatê Me

MAZHAR GÜNBAT

Çapemeniya kurd û ya muxelîf di demeke dijwar de ye. Dewlet di heftiyên dawî de, ji xeynî metodên ku ji berê ve bikardianîn, serî li yên nû jî dixe.
Dewlet niha jî dozgerên xwe dişîne ber deriyê çapxane an jî navenda şirketên belavkirinê, da ku dengê çapemeniya muxelîf bibire. Ev dozger hê ku rojname û kovar dernaketine nivîsên "bizerar" dibînin ji nava wan derdixin. Mesela, ev serê mehek e ku rojnameya Özgür Ülkeyê sansurkirî derdikeve. Hin rûpelên wê bi temamî spî ne û li ser spî peyva"Sansurkiriye" heye.
Dewlet bi vê metoda nû dixwaze ku rojnameyên muxelîf vala derkevin, neyên frotin û dev ji weşanê berdin. Li hemberî van metodên antî–demokratîk gerek e em jî taktîkên nû biceribînin. Li dijî vê bêedaletiyê helbet sîleha destê me ya herî bitesîr berxwedan û yekîtî ye.
Welatê me jî para xwe ji van êrîşên dewletê distîne. Ew raste rast li çapxaneyê Welatê Me sansur nakin ji ber ku

## Anketa Welatê Me

Welatê Me xwerû bi kurdî ye û nikarên li cih wergerînin, lê bi awayên din bi ser me ve tên.
Li Stenbolê li postexaneya Topkapiyê polîs dest datînin ser rojnameyên ku em dişînin Ewrûpayê û welatên din. Bi qasî ku me tesbît kiriye, li manşet û wêneyên wê dinêrin, eger peyvên "bizerar" dîtin dest datînin ser wan (bêî qerara berhevkirinê), na eger tiştekî "bizerar" nedîtin eleqeya xwe jê naynin.
Dîsa heftiya buhurî, dema me hejmara 11. amade dikir, nêzîkî deh polîsên emnîyeta Stanbolê, tevî du defterdaran bi mazereta kontrolkirina defterên muhasebeyê, girtin ser navenda rojnameya me û dest danîn ser lîsteya abone û hin defterên me yên muhasebeyê. Emê li hemberî van metodan li ber xwe bidin û weşana xwe bidomînin.
Li aliyê din rewş û merc çendî dijwar bin jî, em hewl didin ku her hefte rojnameyê xurtir û xweşiktir bikin. Daxwaz, pêşniyar û rexneyên ku xwendevanên me bi telefon û nameyan digihînin me, kêmasiyên ku di rojnameyê de bi me didin zanîn. Bes em bi vê jî nasekinin ji bo ku rojnameyê ji her aliyî ve bedewtir bikin, me pêwist dît ku em anketeke xwendevanan hazir bikin. Vê heftiyê em anketê di rûpela 14'an de pêşkêşî we dikin, da ku hûn dagirin û di demeke kurt de ji me re birêkin. Bi saya vê anketê emê daxwaz, peşniyar, rexne û dîtinin we yên cihêreng hîn bibin û li gor netîceya anketê emê guherînên pêwist di Welatê Me de pêk bînin.
Helbet ji bo ku em netîceyeke objektîf a ku bibe neynika dîtinin hemû xwendevanên me gerek e hejmara kesên ku bersivê bidin anketê hinek zehf be. Ji ber vê yekî em hêvî dikin ku her xwendevanê Welatê me yê ji dil bersivê bide pirsên anketê û bi lezgînî ji me re bişîne. Di şûna eslê wê de hûn dikarin fotokopiya wê jî ji me re bişînin.

**Jêrenot:** Ji ber hin kêmasiyên teknîk, di sê hejmarên destpêka sala 95'an (Hejmarên 6, 7 û 8) de, tarîxa li ser Welatê Me 1994 derketiye. Ji ber ku telafîkirina vê çewtiyê ji aliyê me ve ne mumkun e, ji kerema xwe bila xwendevanên me bila tarîxa li ser van hejmarên di destê xwe de biguherînin. Ji ber vê xetayê em lêborîne ji xwendevanên xwe dixwazin.

**WELATÊ ME**
Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
**Rıza Fişek**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
249 13 44 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atina–** Sîrwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Ol û nîjadperestî li dijî hev in

Ola îslamiyetê, li hemberî nîjadperestiyê ye. Oldar eger bi rastî çavên xwe vekin, li ola ku pê bawerî anîne biniherin, baş lê bikolin wê bibînin ku di ola îslamê de û di hemû olan de wekhevî, aştî, mafê mirovan hene. Ji ber ku hemû gel bi rastî ji bav û dêyekê hatine, ji yekî re jî bêhtir maf nehatiye şandin.
Mirov ji çi nîjadî dibe bila bibe, çi reş, çi spî, çi arî, çi samî hemû wekî hev in. Lê belê îro ew kesên ku bi ola îslamê bêhtir mafên mirovan diperçiqînin, zimanê gelan qedexe dikin, zordarî û tehdeyê li gelê ku ne ji nîjada wan e, dikin. Xwe serdestî wan kirinan dibînin, wan ji xwe re wekî biyaniyan dibînin. Ev tevgerên hanê tev jî li dijî îslamê ne. Li dijî dadiya (edaleta) xwedê ne.
Dema zarokên kurdan diçine dibistanê û bi zimanê tirkî dixwînin, gelek tehdeyî dikişînin. Mamosteyên wan jî vê tehdeyê dibînin. Ev rewşa hanê bêdadiyeke mezin e.
Gava em li hemberî vê tehdeyê derdikevin, em têne girtin, tên zêrandin, tên kuştin. Lê belê di gel van kirinan doza misilmanîtiyê jî dikin û dibêjin: "Li Bosnayê misilman têne kuştin" û gazî neteweyên misilmanê dinyayê dikin ku alîkariya Bosnayê bikin. Ew kurdên ku bi sedan sal in li Koreyê, li Qibrisê, li Çaneqeleyê, li Entabê, li Mereşê xwe di ber wan de dane kuştin, qet nayê bîra wan ku ew jî misilman in.
Wan dikujin, lingên xwe datînin serê wan, resmên xwe didine kişandin, lê qet nabêjin ew jî misilman in.
Bi ser de meleyên wan bi navê ola îslamê li mizgeftan nifiran dikin. Ev ne misilmanî ye, ev ne oldarî ye. Ev ne ola Muhamed (S.S) e. Muhamed (S.S) ev kirin tu car nekirine û ne jî gotiye ku ev bi tenê ola turaniyan û nîjadperestan e. Lewre ol û nîjadperestî li dijî hev in.

**Celaleddîn Yekta**

## Zimanê xwe hêsan bikin

Bi bihara Kurdistanê, bi hokîna şivanan, bi stran û loriyên bêrîvanan, bi kalîna berx û miyan, bi qebaqeba kewan, bi çilîwila çivîkan, bi xulxula avên sulavan, bi baqê nêrgiz û sosin û beybûnan, ez we xebatkarên azadiya Welatê me bi dil û can pîroz dikim. Ewlekarî li ser we be. Ev xebata bi rûmet ya ku di binê siya sîtemkariyê de tê meşandin, gelek bi qedr û qîmet e. Rojnameya me di gel mijarên xwe bi min zehf pêkhatî ye. Rexneyên bidostanî, rohnîker, pêwist e pêsîr jê re vekirî be. Lê rexne û awirên hijbîtiyê (hesûdî) tarîker û şîloker ne bawer im kesên bixiret, tu qiymetê bidinê.
Ez yek ji xwendevanên we me, ji we çend xwestinên min hene, 1– Ji bo hînbûna ziman, zimanê we giran û akademîk e, zimanê xwe hêsan bikin. 2– Tu çavên min ji falê nabire. 3– Zimaneke sivik û nerm bê xebitandin û peyivinin herêmî jî bên bikaranin wê gelek qenc bibe.
Xem û derdên me bi derketina Welatê Me kêm bûn. Bi hêvî me ku her xwendevanek, wê yekî/e din amade bike. Serkeftin ji bo gelê kurd.

**Bêkon Pojan / Mûnîh**

## Rojbaş roniya me

Berî nivîsa xwe ez ji rojnameya 'Welat' re gelek sipasiyan dikim. Zaravayê min dimilkiye (kirdkî) heta rojnameya 'Welat' derneket min bi zaravayê kurmancî nizanibû. Gava 'Welat' derket ji min re çawa deriyek vebe. Min 'Welat' stand û xwend. Ez bi xêra 'Welat' hînî xwendina kurmancî û axftinê bûm. Hêviya min ji rojnameya Welatê Me ew e ku doza rojnameya Welat dom bike û di her warî de cih bide nivîsan. Daxwazeke min a din jî ew e ku, Mele Abdurrahman Dürre jî di rojnameyê de binivîsîne. Ferhengokek gereke di rojnameyê de hebe.
Ez rojnameya Welatê Me li gelê me pîroz dikim, di xweşiyê de bimînin.


**Cemil Oğuz / Enqere**

## FERHENGOK

**Aso:** Ufq (ufuk)
**Azmûn:** Îmtîhan
**Bermayî:** Eserên kevin (kalıntı)
**Beş:** Qisim (bölüm)
**Daçek:** Edat, prepozîsyon (İlgeç)
**Dadan:** Girtin, radan (kapatmak)
**Encam:** Netîce (sonuç)
**Gemaro:** Ablûka, ambargo
**Komar:** Cumhûriyet
**Kemîn:** Tele, dafik (Pusu)
**Kovan:** Hizin (hüzün)
**Olan:** Akîs, vedana deng (yankı)
**Paşeroj:** Borî, mazî (geçmiş)
**Pêşeroj:** Dahatû, atî (gelecek)

www.arsivakurdi.org

# PIRA MALABADÊ



Malabadê, hem navê gund e, hem navê çem e û hem jî navê pira navdar ku niha xemgîn û xeydan e. Pir, li ser çemekî wisan e ku bi hindikî salê mirovek jê re dibe qurban.

Min dil nîn e ku ez li ser gund û çemê bi navê pirê, bisekinim. Pira xembar pir bala min dikişîne.

Li serê nivîseke bi zimanê tirkî heye. Wiha ye:"Artuklulardan Timurtaş Gazi tarafından 1147 yılında yapılmıştır" Heke em nivîsê wergerînin ser zarê kurmancî tê vê maneyê: "Ji Artukiyan ji hêla Timurtaş Gazî ve di sala 1147'an de hatiye çêkirin." Navê pirê jî guherandine, kirine Çatal Köprü.

Pira Malabadê, ji kevirên şehkirî hatiye lêkirin û gerokê (seyahê) tirk Evliya Çelebi di gernameya xwe de vedibêje: "Ez li tu derî rastî hempayekê vê pirê nehatime."

Malabadê li ser navçeya Farqînê ye û sînorê Amed û Êlihê pê ji hev tê qetandin. Çar çaviyên wê hene, ji bilî çaviya mezin dudo li aliyê rojava û yek jî li aliyê rojhilatê dikeve. Jixwe kemera çaviya mezin dengê pirê bi dinyayê xistiye. Erê, tu pireke ku qewsa wê ji keviran ewqas fireh hatibe çêkirin, nîn e.

Du odeyên pirê jî hene ku ji gelek kesan re bûne war. Yek li aliyê rastê ya çaviya mezin û yek jî li aliyê çepê dikeve. Karwan û rêwî, şevên xwe tê de bihurandine. Şevbihêrk derbas kirine. Dengên zîz û bişewat di hundirên wê de olan dane.

**Li gorî çîrokekê keça qiral ev pir daye lêkirin û wiha gotiye:**
**Pira Batman e**
**Bikefîl û deman e**
**Ku Xwedê xera neke**
**Xera nabe heta axrê zeman e.**

Ev pira navdar û bihizin, gelek tamîrat dîtine. Çi heyf e ku bi van tamîratan pir hatiye "asîmilekirin" û ji eslê xwe gelek bi dûr ketiye. Tamîrata cara paşîn, ji ber kesinen hişyar nîvco hatiye hiştin. Lewre bi destê nezanan pir dihate dûtin(sehandin) û kîtabe û rolyefên li ser dîwarên wê dihatin nixumandin. Her wiha, bi kirinên vî tehrî Pira Malabadê ketiye rewşeke ku nayê naskirin.

Divê bê gotin ku navekî pirê yî din jî heye :"Pira Batmanê"

Li ser vî çemî dîsa pirek bi navê Pira Kemûkê heye. Ev ji Pira Malbadê kevintir e. Em mixabin ku wê Pira Kemûkê di binê ava Beraja Batmanê de bimîne, wekî bajarê Heskîfa (Hesenkeyfa) kevnare.

Der barê pirê de zehf çîrok hene. Di nava gel de baweriyek heye ku pir ji aliyê Badê kurê Dostik ve hatiye avakirin. Dîroknivîs Îbn–ul Erzaq el Fariqî,bi me dide zanîn ku ev kes avakerê Dewleta Merwaniyên Kurd e û di sala 985'ê zayînî de Meya farqîn (Silîvan) bi dest xistiye. Gelek xerabî û neheqî li pirê hatine kirin. Hema tenê em guh bidin Hesen Hişyar wê bes be bi ya min, ku li Qereqola Malabadê beriya serhildana Şêx Seîd (di sala 1924'an de) leşkerî kiriye. Di pirtûka xwe ya bi navê "Dîtin û Bîrhatên min", rûpela 233'yan de wiha dibêje:

1. Di bedena Amedê de bi navê Dewleta Dostikiya Kurd di kevir de asareke kolandî hebû ew kevir rakirin.

2. Li ser pira Çemê Batmanê (Pira Mala Badê Z.F.) di bilindahiya başûr de nivîsarek bi kurdî hebû. Çend silim bi ser hev ve girêdan, yek derxistin jor bi çakûçan ew nivîsar jî tev de şikênand.

3. Li ser çaviya Dîcleyê Şikeftên Birqlîn hene ku di zemanê jiyîna şikeftan de ew der jêderên pêşiyên kurdên Huriyan e, li ser deriyê şikeftan, di kevir de kolandî hin nivîsarên wan zemanan hebûn. Li ber derî jî heykelek hebû. Pênc sed kaxiz dane yekî ji qezaya Licê bi navê Hesoyê Perîşanê, derket ser wan siliman û bi çakûçan ew nivîsar şikênand û ew heykel jî birin...*

Hesen Hişyar bi me dide zanîn ku çi bi serê hêjahî û bermayên dîrokê yên vî gelî de hatine. Belê, ev yek di dema Abdîn Özmen de qewimîne ku ev kes mufetişê Umûmî yê herêmê bûye. Îro navê wan bûye Waliyê Herêma Taybet. Piştî daxuyanî û saloxiyên ku rehmetiyê Hesen Hişyar dide me, mirov çi bibêje jî ne bes e.

** ji bo ku nivîs baş were fêmkirin min bi tenê destê xwe da rastnivîsa Hesen Hişyar.*

**ZANA FARQÎNÎ**